

Koma Gulên Xerzan:  
Gerek e em şerê li  
welatê xwe bînin ziman

Rûpel 3

Ji pîreka Savaş Buldan, Pervin Buldan daxuyaniyên balkêş:

**'Dalan ji bo ku bi Savaş û Adnan  
re têkiliyê deyne mirov xist dewrê'**



NAVEROK



Xendal Astore: *Gelê ku dîroka wî nehatiye nivîsîn* (1)

4



Nirxandina Filmê Dîwar: *Rûyê rastînê sazûmanê*.

7



Pexşana Hesen Zinar: *Têkçûna Ehrîman*.

12

Ji Xwendevanan

EZ dixwazim bi vê nameya xwe ji bo mijok û paşxwera bidim xuyakirin ku, êdî fen û fûtên wan pere nakin. Ev bû sê car ku du polisên sivil tene bal min. Cara ewil hatin çay vexwarin û çûn. Cara duduyan hatin pirsra karê min kirin, nasnameya min, ji min stendin, navê min nivisandin û çûn.

Cara sisyân hatin li bal min behsa hinek tiştên sosret kirin. Gotin: "Te qet kaçaxçitî kariye? Têkiliyên te bi kîjan partiyê re hene. Te raya xwe daye kîjan partiyê. Têkiliyên te bi HADEP'ê re hene, tu sevkîyata eşya bi ku derê rê dikî?" Min lewheyê Ehmedê Xani daye HADEP'iyân. Carcaran ez bi telefonê bi HADEP'iyân re dixaxifim. Li telefona dikana min guhdarî dikin. Tiştine pir sosret ji min pirsîn. Polisan behsa eroinê kirin. Gotin: "Te qet îşê eroinê kariye an na? Hin agahî bi ber guhên me ketine der heqê te de... emê dîsa werin" û çûn. Ez baş dizanim ku ev komployek e. Dîsa jî dibêjim, jî bo gel çî lazîm be ez amade me.

Z. BAZÎDÎ

ARAMA dirokê, hevî û livbaziya xweşikbûnê ya herî pîroz di şerê azadiyê de ye. Ew şer, dijmin dibehcîne û dostên gel kêfxweş dike, di sala 1996'an de gihîşt asta herî jor. Ji rastiya rebaza serokatîyê û manifestoya gel, hêz û dileweriya me girtîye. Emê li ezmanê welatê xwe serfiraziye binivîsin. Em bi vê bawer dikin û ji bo vê jî bi şahiyê mezin sala nû silav dikin. Ez dîsala nû de, li welatekî azad, di ked û xelata we de serkeftî dixwazim.

NESRULLAH KURAN



Pirêzeya par hêviya aştiyê dikuje

SAMI TAN

Me salek li pey xwe hişt, em ketin sala 1997'an, her kes ji aliyê xwe ve bilanço ya salê derdixe. Bûyereke ku di dawiya sala 1996'an de pêk hat, mora xwe li salê xist. Sala 1996'an mirov kare wekî 'sala diyar bûna qirêjiya dewleta tirk' bi nav bike. Tiştên ku bi salan in kurd dibêjin, êdî her kes dibêje. Bi awayekî şermokî be jî tê gotin ku hinekan bi handana dewletê mirov kuştine, mirov şelandine, dizî kirine.

Serkaniya Giştî ya Artêşa Tirk (Genel Kurmay) ji bo guhertina rojevê di roja dawîn a 1996'an de êrîş bir ser Başûr, dîsa didin zanîn ku bi dehan gerîla hatine kuştin. Bes êdî kes ji wan bawer nake. Berî çend rojan jî bilanço ya şer weşandin, li gorî vê bilanço yê di salekê 2782 gerîla hatine kuştin, li aliyê din 531 leşker hatine kuştin. Ev hejmar her çiqas jî rastiye dîr bin jî, di warê gurbûna şer de ramaneke didin. Lewre Tansu Çillerê bi devê xwe got ku her roj sê leşker tene kuştin. Li go-

rî hesabê wê hejmara leşkerên ku hatine kuştin ji hezarî dibore. Êdî tu gund û navçeyên ku cendekên leşkeran neçûne neman. Di 1996'an dewleta tirk nikaribû kirinên xwe yê ne-mirovî wekî berê weşêre. Valakirina gundên Dêrsim û Sêwazê li seranserê dinyayê hate bihîstin û dewleta tirk hate şermezarkirin. Dîsa hêzên dewletê nikaribûn şewitandina 11 gundiyan Basayê, kuştina mamosteyan bixin stûyê PKK'ê. Di vê salê de dewleta tirk jî ber kirinên xwe li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê jî mehkûm bû.

Sala 1996'an bi çalakiyên malbatên windahiyan jî deng da. Komicivîneke navneteweyî hate lidarxistin. Dîsa li hemberî kirinên hovane yê rayedarên girtîgehan, rojiyên mirinê çêbûn. Rojî bi şehidbûna 12 girtiyan qediya, lê dilê rayedarên dewletê pê xweş nebû, îcar 10 girtiyan azadiyê li Girtîgeha Amedê kuştin. Bûyereke ku rengê xwe da salê jî, bi destê polîsan kuştina nûçevanê Evrenselê Metin

Göktepe bû.

Ji aliyê kurdan ve Kongreya HADEP'ê çalakiyên xwefedayî, şerê YNK û PDK'ê, biryara valakirina Kampa Etrûşê, meş û festîvalên li Ewropayê, avabûna rêxistinên wekî Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê, Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê, enstîtuyên kurdî divê bîn bibirandin.

Di sala 1996'an de li dinyayê Tirkiye zêdetir teşîr bû. Êdî nikare ji Amerikayê jî wekî berê bi rihetî çekan bistîne. Çalakiyên kurdên wê derê dewleta tirk gelekî tengav dikin. Bi taybetî çalakiyên Tora Agahiyan a Kurdên Amerikayê (AKIN) gelekî bala raya giştî ya amerîkî dikişînin. Girtina Serokê AKIN'ê Kanî Xulam jî wekî bûyereke girîng cihê xwe di nav bûyerên sala 1996'an de girt.

Par, di warê aştiyê de jî hin gav hatin avêtin. Roja aştiyê bi çalakiyên dorfireh hate pîrozkirin, hevdiîna Ismail Nacar bi Erbakan re bû sedema bilindbûna dengê aştxwazan, lê ew deng jî aliyê MGK'ê hate birîn. Kampanyaya îmezîya ji bo aştiyê û berdana leşkeran mirov dikare wekî bûyerên sereke yê ji bo aştiyê bi nav bike.

Dil dixwaze rayedarên tirk ji van bûyeran encameke mirovî derxin, lê mixabin kirinên wekî ya Licê û rapora MGK'ê hêviya mirov dişikînin.

Sedemên jiyan û mirinê

BEHCET DENİZ

Berî her tiştî divê em xala mirin û jiyane ji hev vekin, ka mirin û jiyana çî ye û çî nîn e. Mirin û jiyana du diyardeyên dijberî hev in. Pêwîst e ku baş bîn nasîn. Jixwe nakokî nebe peşketin jî nabe. Mirin dijberî jiyane ye, jiyana jî navê panjehra mirinê ye. Li hemberî mirinê, miftiya deriyê jiyane jî şer e. Tu car bêyî şer jiyana nameşe. Di zagonên zanistiyê de jî û di zagonên xwezayî de jî bi vî awayî ye.

Wekî ku tê zanîn şer agir e, riya jiyane ronî dike, ji bo gelê bindest fener û find e, cejn û jiyana e. Ger baş were pêkanî wê demê riya jiyane tê vekirin, ger baş neyê zanîn û neyê bikaranîn mirin û tim li devê derî sekinîye. Lê, cureyên mirinê hene. Mirinek heye bi gewde ye, fikr û ramanên wê di xizmeta mirovahiyê de ye, bi fikr û ramanên wê bi hezaran gel jî zilm û zor û jî mirinê xelas dibin. Ev mirin, mirineke birûmet e û ev ruh tim û tim dijî. Lê mirinek jî heye kesê ku bi vê mirinê diçe çiqas zindî jî tê xuyan, ne bi mirina xwe, ne jî bi mayîna xwe ji mirovahiyê re tu feydeke wî tune ye. Ev cure mirî dema li ser piyan e jî, tu pêwendiyên wî bi jiyane neman. Xêra wî ne jî dêrê re heye ne jî ji mizgeftê re. Mirina bêmebest e, tu nişaneke rûmeta jî nê li cem kesên ku bi vê mirinê diçin, nemaye. Ev mirovên wiha ne dizanin bi jî ne jî dizanin bimirin. Zindî nê, lê hezar carî ji miriya xerabtir in. Ev mirovên

Di dîrokê de her tim ev pirsgrêk mirin û jiyana hatiye holê, di her qonaxê de jî lêgerîna çareserkirina vê pirsê hatiye pêşiya me û gelek serî eşandiye. Lê îro dîroka gelê kurd bi tevayî hatiye guhertin.

wiha di nava civakê de jî bînirx û lenetkirî ne. Li pêşiya jiyane jî asteng in, tu kes rûmetê nade.

Jiyana jî têkilî û pêwendiyên civakî ye, bi rastî bersiva pirsra jiyane wisa sivik nîn e. Ev pirsgrêk di her şerê çînî û neteweyî de hatiye holê. Em dikarin bibêjin ku her şoreşek jî nivê bersiva jiyane ye. Yanê afirandina jiyane nû ye.

Di dîroka mirovahiyê de mînak pir in. Wekî şoreşa Fransayê, ya îslamiyetê û şoreşa mezin a 17'ê kewçêrê ya Rûsyayê. Di van şoreşan de gelek rêber û lehengên dîrokî canên xwe feda kirine, bûne deriyê riya jiyane û jiyana mezin di şexsên xwe de dane destpêkirin û jî bo jiyane bûne xwediyê çalakiyên dîrokî. Hewce nake ku em behsa wan bikin. Ji xwe di demêkê nêzik de, di dîroka gelê me de jî çalakiyên azadî û jiyane ên giyanfedayî dest pê kirin. Îro em li gelê kurd dinihêrin, dijmin û dagirkeran tu derfetên jiyane nedane wan. Gelê kurd di vî warê jiyane de pir teng maye. Di hêla neteweyî û civakî de û di hêla siyaset, fikr û ramanê de jî tu peşketin nehatiye çekirin. Gelê kurd ji nava têkiliyên malbatî û eşîrî û êliyê zêdetir demeketiye derve, îro jî ger bi "pirani" gelê kurd li hemberî têkoşîna azadiyê şer dike an jî dibe asteng, sedemên wê bi qasî ku xebata dijmin e, ew qas jî tesîra bir û bawer-

riyên kevneşopî ye ku li ser wan çêbûye.

Di dîrokê de her tim ev pirsgrêk hatiye holê, di her qonaxê de jî lêgerîna çareserkirina vê pirsê hatiye pêşiya me û gelek serî eşandiye. Lê îro dîroka jiyana gelê kurd bi tevayî hatiye guhertin. Ji bo gelê kurd jiyana bûye "mirin" û mirin jî bûye jiyana. Mirina gelê kurd îro bûye bombeya jiyane.

Ev bombe, li bajarê Dêrsimê hevala Zilan di nav dilê dijmin de teqand. Tirs û xofa mirinê xiste nava dilê dagirkeran û şahiya jiyane jî xiste nava dilên gelê xwe. Tiştê girîng ew e ku di qonaxeke nû de, mirov karibe bibe rêber û rê li pêşiya gelê xwe veke, pişt re dawiya wî tê. Mirovek ku xwediyê armaneke mezin be, bi armanca xwe ve bi bir û bawerîya xwe ve girêdayî be, bi jiyane re jî pêwendiyên wî xurt bin, ew kes dibe xwediyê çalakiyên mezin û yê dîrokî.

Bêguman ji bo şexsiyetên wisa giran buha mirov dikare vî tiştî bibêje; ji bo wan mirin jî, jiyana jî wekî hunerê ye. Ew şexsiyetên ku baş zanibe wê çî çax û çawa bimire, ew, ji her kesî çêtir jî dizanin wê çawa baştir bijîn! Ew bi mirina xwe dizanin wê jiyaneke çawa bi destên xwe bidin avakirin. Ji bo wan, sedema jiyane dibe sedema mirina baş. Bi rastî xwediyên jiyane jî ew bi xwe ne-





TBMM'ê jî dest bi kampanyaya xwîne kir. Serokê TBMM'ê Mustafa Kalemli di roja 31'ê berfanbara 1996'an de ji bo serdana (ziyaret) leşkerên birîndar çû Nexweşxaneyê Leşkerî ya Gulhaneyê (GATA). Kalemli li vir di axaftina xwe da diyar kir ku wê digel GATA'yê organizasyonekê pêk bînin, ji bo ku ew ji leşkerên birîndar re xwîne peyda bikin. Wî got:

"Ji bo serkeftina vê kampanyayê armanca me ew e ku em ji kesên ku tên serdana TBMM'yê jî xwîne bistînin."

Wisa xuya dibe kesên ku herine meclîsê (ji bo çî dibe bila bibe) wê jî xwîna xwe bibin.



Hêzên artêşa tirk di sa ketin başûrê Kurdistanê. Li gorî Serkaniya Artêşa Tirk, hin gerilayên ARGK'ê daxwaz kirine ku êriş bibin ser tabûra seyar. Li ser vê istixbaratê leşkerên tirk êriş birine ser herêma Sinahtê û li wir şer derketiye.

Di daxuyaniya Serkaniya Artêşa Tirk de tê ragihandin ku 72 gerilayên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê (ARGK) hatine kuştin û 2 heb leşker mirine, 7 heb jî birîndar bûne. Çavkaniyên ARGK'ê daxuyandin ku hejmara windayên wan ji aliyê rayedarên artêşa tirk ve tê zêdekirin. Li aliyê din gerilayan avêtin ser Pîranê û Erzîna Hatayê û Erxaniya Amedê radyofîngê rûxandin..

## NÛÇE

# Ji pîreka Savaş Buldan Pervin Buldan daxuyaniyên balkêş: 'Dalan ji bo ku bi Savaş û Adnan re têkiliyê deyne mirov xist dewrê'

**Pervin Buldan daxuyakirin ku Bedrettin Dalan bi xwe ji bo ku Savaş Buldan û Adnan Yıldırım nas bike Cîgirê Mudirê ISKÎ'yê xistiye dewrê. Pervin Buldan got ku di sala 1993'yan de jî bi mebesta kuştina Savaş Buldan polis carekê avêtine ser mala wan. Her wiha wê diyar kir ku ji bo ewletiya canê xwe Savaş Buldan û Adnan Yıldırım bi zanebûn bûne cîranê Mehmet Açar.**

Piştî bûyera Susurlukê hin çalakîyên kontrayan ji êşkere bûn. Berî çendekî jî timê taybet Ayhan Çarkın got: "Savaş Buldan, Behçet Cantürk, Medet Serhat min kuştin." Li ser van gotina careke din kuştina karsaz û karbidestên kurd hate rojevê.

Ji ber vê yekê me xwest em li ser kuştina Savaş Buldan û karsazên kurd ji Pervin Buldan dîtin û ramanê wê hîn bibin. Wê jî bi kêfxweşî deriyê mala xwê ji me re vekir.

Li ser pîrsa me ya bi şeweyê, "Çi têkiliya kuştina Savaş Buldan bi bûyera çeteyan re heye", ew bi bîr dixu ku yek ji robot resimên bikujên Savaş û hevalên wî dişibe Abdullah Çatlı. Cara yekemîn rojnemeya Demokrasiyê bal kişand û yekê, bes medya tirk eleqê nîşan neda. Dîsa Pervin Buldan dide zanîn ku Savaş û hevalên wî ji Hotela Çınar a bi 5 stêr ku li Yeşilköyê ye, ji aliyê polîsan ku di destê wan de bêtêl hatine, birin. Ew ji wir birine navçeya Boluyê ya bi navê Yığılca, heta wê derê ji gelek kontrolên polîsan derbas bûne, bêyî astengî.

### Fermana Tansu Çillerê

Ew diyar dike ku karsazên kurd li ser fermana Tansu Çillerê hatine kuştin. Wekî tê zanîn Tansu Çillerê di sala 1993'yan de li Hotela Hollydayê di civîneke çapemeniyê de gotibû "di destê me listeya karsazên ku alîkariya PKK'ê dikin heye, emê ji wan hesab bipirsin."

Pervin Buldan piştî ku sedema kuştina mêrê xwe bi welatparêziya wî ve girê dide, dide zanîn ku di sala 1993'yan de bi mebesta kuştina Savaş, avêtine ser malê, lê ji ber ku Leyla û Mehdi Zana li wir bûne, negihîştine armanca xwe.

Buldan îdiayên ku "Savaş Buldan karê nehênî û kirêt dikir" red dike û pişt re jî dibêje: "Heke van mirovan karên ne-qanûnî dikirin, çima dozger, dadgerên dewletê tune bûn, bila ew bigirtana, bidarizandana, çima ew kuştin?" Pişt re jî gotinên Bedrettin Dalan ên bi rengê "Adnan Yıldırım ji min re 500 milyar anî, ji ber ku pereyên kirêt bûn, min negirtin", bi bîr dixu û dibêje: "Lê wî bi xwe Cîgirê Gerîndeyê ISKÎ'ê xistiye navberê ji bo ku Savaş Buldan û Adnan Yıldırım bina-

se. Niha jî li dîv miriyan van gotinan dibêje, ji bo ku xwe paqij nîşan bide."

### Açar cîranê me bû

Digel îtîrafa Ayhan Çarkın, tiştekî din ku bala medya tirk kişand ser malbata Buldan jî, cîraniya wan a bi Mehmet Açar re bû. Piştî êşkerbûna û cîranîyê jî gelek televîzyon û rojnemeyan hatine, hin pîrs jê kirine, wê jî gotiye: "Ez bang li wezîrên edaletê, dozgeran dikim, Ayhan Çarkın li xwe mikur tê ku Savaş Buldan, Medet Serhat, Behçet Cantürk wî kuştîye, heke bigota min Çetin Emeç, Uğur Mumcu kuştîye, wê ew darve bikirina, niha ji bo wî çî difirin?" Lê medyaya tirk cih nedaye gotinên wê.

Roja ku Savaş Buldan û hevalên wî direvînin, Pervin Buldan tevî jina Adnan Yıldırım, dixwazin herin mala Açar, ji pîreka wî jivaneke (randevûyê) bistînin ji bo ku xwe bigihînin Açar, lê nikarin. Li gorî wê deriyê mala Adnan Yıldırım û yê Mehmet Açar di hev de bûye, jina Adnan Yıldırım ji jina Açar jivanê dixwaze, lê ew dibêje: "Em niha diçin Enqereyê, li vegeerê emê hev bibînin." Piştî vê yekê hema di cih de ji polîsan telefonê, dibêjin "Savaş Buldan û hevalên wî di binçav de ne", lê paşê bi telefoneke din dibêjin "Xelefî çêbûye." Pişt re jî Savaş û hevalên wî tên kuştin.

Li ser nûçeyê Inter-starê, Mehmet Açar îdia kiriyê ku haya wî ji vê cîranîyê tune, Pervin Buldan li wê kanalê geriyaye û daye zanîn ku Mehmet Açar derewan dike. Ew bi bîr dixu ku kesên ku dibin cîranê kesên ji emniyetê, der heqê van de lêpirsîn çêdibe, heta jina M. Açar jî ji kesên derdorê pirsîye ka S. Buldan û A. Yıldırım çî karî dikin, ji ku ne? Em ji Pervin Buldanê hîn dibin ku Savaş Buldan û Adnan Yıldırım ev cîranî ji bo ewletiya xwe baş dîtine, gotine:

"Em cîranê Açar in, ew site baş tê parastin, lewre jî nikarin bi hêsanî tiştekî bi me bikin." Piştî ku Ömer Lütfi Topal tê kuştin, Mehmet Açar mala xwe ji wir dibê.

Wekî encam Pervin Buldan wiha dibêje: "Savaş



Buldan, Hacı Karay, Adnan Yıldırım li ber deriyê Hotela Çınarê birin. Li ser deriyê û hotelê kamera heye ku bergeha wê 1300 metre ye. Berî vê bûyerê bi du rojan çenteyê jinekekê winda dibe, bi saya kamerayê tê dîtin. Me jî di heman rojê de xwest ku kasetaya kamerayê bibînin, lê bi fermana hin kesên rajorîn, ew daxwaza me hate redandin, gotin ku kamara xera bûye.

Ev qas xebatkarên hotelê hene kes tu agahiyê nade. Şofêrê taksîyê hin tişt dizanîn, me xwest ku em wî bibînin, lê ji holê winda bû. Paşê gotin li şofêr negerin, hûn nikarin bibînin, herhal ew ji holê rakirin."

Pervin Buldan bi van gotinan dawî li axaftina xwe tîne: "Heta sistem neguhere, wê kuştinên bi vî rengî bîdomin, heta ku bikujên wekî M. Açar û Ayhan Çarkın serbest bigerin, dawî li kuştinên "faîlî meçhûl" nayê. Bi vî awayî dewlet nikare rê li ber tevgera kurd bigire û dawiyê li têkoşîna azadiyê bîne. Lewre gelê kurd roj bi roj hîn zêde berxwederê û têkoşer dibe."

SAMÎ BERBANG/DILDAR ŞEKO



Gelê ku dîroka wî nehatiye nivîsîn (1)

# Dîrak bi nivîsê dest pê nake

XENDAL ASTARE

**Heke em nivîsê hem wekî kirde, hem jî bireser (nesne) bi kar bînin, divê em nixên berî nivîsê jî bîr bikin. Heke dîrok bibelgekirina berhemên mirovan be, dema mirov dîrokê bi nivîsê bide destpêkirin, gelo mirov jî zanistiyê dîr nakeve? Di pirtûkê tê dîtin ku nivîskar dema nivîskî derdixe pêş.**

**D**ema min cara pêşîn pirtûka Gürdal Aksoy a bi navê "Gelê ku dîroka wî nehatiye nivîsîn" xwend, hinek pirs di serê min de çêbûn. Bi dîtina min aliyê balkêş ê vê xebatê ev e ku Aksoy bi zimanekî sivik hin rastiyên li ber çavan radixe. Lê jî aliyê naverokê ve hinek nakokî, alozî û çewtiyan di nava xwe de dihevine. Heke bi tenê de hinek çewtî hebûna, zirar tunebû, heta dikaribû xwendevan motive bikirana jî bo hînbûna rastiyê.

Ev xebat wekî lêkolîneke cihêreng xuya dike, bes bi tenê ew cihêrengî teşeyî (şiklî) ye, ku ew jî bi xwe re derî li hinek xeletiyên vedike. Bi taybetî jî bo kesên ku li ser mijarê ne xwedî agahiyên dorfireh in, bi xwendina wê pirtûkê dibe ku hinek encamên ne rast ji pirtûkê derxin. Digel vê yekê jî divê piştgiriya xebatên bi vî rengî bê kirin.

Jixwe nivîskar jî dide zanîn ku ew dixwaze nîqaş li ser mijarê çêbin. (r.9). Her wiha ew dibêje gerek "Bi çavekî rexneyî ev xebat bê nixandî û tiştêkî wiha wê ji bo min bibe alîkarî, bes bi şertê ku ew rexne (çi erênî, çi jî neyînî) bi sewiyê bin." Dîsa ew dibêje:

"Ez ji niha ve didim zanîn ku ezê tavîzê nedim nêzîktêdayînên reaksiyoner û romantîk." (r.10)

Ji ber ku ez bi pîvanên wî nizamim, ez dikarim bi tenê jî tiştên ku wî nivîsandine bikevim rê, dîtin û ramanên xwe bînim zimên, ez hêvî dikim ku bigihîje encama xwe.

Ezê ramanên xwe yên li ser vê lêkolînê bi riya veguhastinê (îktîbas) ji pirtûkê diyar bikim, jî ber ku wiha ez gotinên min baştir bînim fêmkirin.

Nivîskar bi xwe navê dîrokzan li xwe nake, ew xwe wekî lêkolînerekî jîrek dibîne. Ev gotinên nivîskar dibe sedem ku mirov bi awayekî erênî nêzî wî bibe, zêde bi ser de neçe, bes ew nayê wê wateyê ku emê di ser çewtiyan re qewaz bidin. Berî demê li ser vê pirtûkê rexneyeke Faik Bulut di rojnameya Demokrasiyê de derke, di vê nivîsê de ezê, wê nivîsa rexneyî jî li ber çavan bigirim.

Di despêka pirtûkê de (r.7) gotineke bi vî rengî heye: "Helbet ê ku ronahiyê dixin ser, ê ku berê rastiyê diguherîne jî ne dîrok, lê dîrokzan bi xwe ye." Ji van gotinan jî tê fêmkirin ku mirov dikarin malzemeyê di destê xwe de li gorî dilê xwe bi kar bînin, çi bi nivîskî, çi jî bi devkî. Dîsa nivîskar diyar dike ku mercên civakî, aborî û siyasî rengê xwe dîtin xebatên dîrokzan û wiha didomîne:

"Yanê dîrokzan di bin bandora hin hestên xwe de dimînin û nikarin bi awayekî objektîf nêzîkî dîro-

kê bibin. Bêguman heke xwe ji bandora van hestan (wekî hestên neteweyî) rizgar bikin jî, ne diyar e ku wê çiqas karibin dîrokeke objektîf binivîsin." (r.7)

Di baweriyê min de heke mirov vê pirsgirêkê gelemperî bike û pişt re li çareyê bigere, mirov nikare jî navê derkeve. Nêzîktêdayîneke bi vî rengî di pirtûkê de jî tê dîtin.

Li ser objektîfîyê mirov kare vê bibêje, li gorî mercên heyî, heta jî mirov tê divê objektîfî hebe, jixwe heta bingeh jî objektîfîyê re neyê afirandin, mirov nikare objektîf bibe:

"A rast ji despêka dîroknivîsînê heta niha, li nik dîroka ku hatiye nivîsîn, a ku nehatiye nivîsîn jî heye, sedema vê yekê jî ew e ku nivîs di bin pawana (hin kesan de bûye."

Di rûpelên pêş de heman (eynî) ravekirin jî bo oldaran jî tê bikaranîn. Teqezkirina (keşîfkirina) nivîsê li ser xebata mirovên berî wan pêk hat, yanê jî ezmên nehat xwarê. Bi taybetî perisîna mirov jî aliyê fizîkî û hişmendiyê ve rê li ber vê yekê vekir. Dîsa bi perisîna xencereya mirovan, axaftinê dest pê kir. Her wiha siruştî ye ku piştî derketina dubendîya çinayetî, çîna serdest nivîs xistine xizmeta xwe, li gorî berjewendiyên xwe bi kar anîne.

Li gorî baweriyê min diviyabû di pirtûkê de li ser qonaxa heta derketina nivîsê bihata sekînin. Heke dîrokê bi navê "nivîskî" û "nenivîskî" dike du beş jî

diviya ev yek bida zanîn. Heke wisa be divê du şêwe mirov hebin; mirovê bi nivîs û mirovê bênivîs. Li pey vê tespîta jorîn, nivîskar li gotina xwe zêde dike:

"Nivîs di qonaxa dîrokê de her tim di bin pawana dewletê de maye." (r.8)

Ev tesbît di cihê xwe de ye, bes diviya bû li ser sedemên vê yekê bihata rawestîn. Heke nivîs bi destê hin kesan hatibe afirandin, çawa jî destê wan derketiyê, egerên vê yekê çî bûn, diviya bû bi dorfirehî bihata vegotin. Piştî vê gotinê jî wiha didomîne:

"Lê wir mebesta me lêkolîna li ser metodolojiya dîroknivîsana kurdî ye ku van salên dawîn derketiyê holê." (r.9)

Heke nivîskare bawer dike ku hin kêmasî di warê metodê de hene divê jî bo avakirina metodeke rast xebatê bike. Ji metodeke rast jî ramanên zelal divê:

"Ji bo min tiştê girîng ev e ku ez rastiyê derxim rastê. Rastî bi polîtîkayên rojane dernakevin rastê, mesele afirandin polîtîkayên li gorî rêbazên zanistî û li dîv rastiyê ne." (r.9)

Ji bo pêkanîna polîtîkayên bi vî rengî, divê mirov li ser tiştên ku heta niha hatine afirandin bisekîne û mentiqê wan derxe holê, tevî derketina zimanê nivîskî û qanoxên ku wê derbas kirine. Li gorî baweriyê min jî divê em dev ji polîtîkayên rojane berdin, bi polîtîkayên dîr û dirêj kar bikin. Heke ne wisa be nixên ku hatine afirandin jî di avê de diçin. Li aliyê din tiştên ku ji berjewendiyên rojane hatine afirandin, tevî agahiyên çewt, rê li ber afirîneriyê digirin û li ber guherînên civakî dibin asteng.

Ger tê gotin ku dîrok ji mirovan dest pê dike, dîrok bibelgekirina serpêhatiya mirovan e, tiştê ku dikeve ser milên dîrokzan zanistîbûn û objektîfbûn e. Dîrok her tişê têkildarî mirovan e. Nivîskar di vî warî de cih daye gotineke Marks, ew dibêje:

"Dîrokeke mirovan heye, lewre divê mirov mercên jiyane pêk bînin û divê vê yekê jî bi awayekî bikin. Ev yek jî aliyê awayê rêxistina wan û hişmendîya wan ve tê diyarkirin." (r.4)


Di encamê de dîrok jî wekî gelek şaxên din ên zanistê bi belgekirina berhemên mirovan û pişt re jî ragihandina nîşên nû bi pêş dikeve. Lewre jî bi şaxên zanistê yên din re jî têkildar e.

"Her wekî çawa ku nivîs afirandineke mirovan e, çî jî di dawîya dawiyê de bi destê mirovan hatiye afirandin." (r.5) û "Lewre jî tiştê ku dîrokê dike dîrok, ne nivîs e lê mirov bi xwe ye." (r.15)

Li gorî van gotinên jorîn divê em mirov jî xwe re bikin navenda lêkolînê, bes, dema em wisa bikin, divê em mirov bi kirinên wî biwezînin, bidarizînin.

Wexta ku em bi giranî lêkolînê bidin ser mirov, divê em nivîsê wekî alîkar binirxînin. Nexwe heke em nivîsê hem wekî kirdê, hem jî bireser (nesne) bi kar bînin, divê em nixên berî nivîsê jî bîr bikin. Heke dîrok bibelgekirina berhemên mirovan be, dema mirov dîrokê bi nivîsê bide destpêkirin, gelo mirov jî zanistiyê dîr nakeve? Di pirtûkê tê dîtin ku nivîskar dema nivîskî derdixe pêş.

WERGERA JI TIRKÎ:  
SAMÎ BERBANG



**N**ivîskar bi xwe navê dîrokzan li xwe nake, ew xwe wekî lêkolînerekî jîrek dibîne. Ev gotinên nivîskar dibe sedem ku mirov bi awayekî erênî nêzî wî bibe, zêde bi ser de neçe, bes ew nayê wê wateyê ku emê di ser çewtiyan re qewaz



# Dûmahîka nivîsa mamoste Zana

**Birêz Zana Farqînî zimanê xweserî zarokan hildabû dest û vekofîneke zanistî li ser kiribû. Her wekî mamoste Zana jî anîbû ziman di vê xebat û çalakîyê de, divê rewşenbîr bi sînor nemîne û her ev lêgerîn û lekolîn bi berdewamî bê kirin.**

**D**i heftayên borî de mamoste Zana Farqînî, li ser zimanê xweserî zarokan rawestiyabû. Birêz Zana bi hin nimûne û mînakên balkêş, bal kişandibû ser girîngî û jêneriya zimanê zarokan.

Bi rastî nirxên gelekî her çendî nixamtî bin û di kûrahiya şevrê û tariyê de û di nava dilê qedexê de veşartî bin jî zor girîng pêwîst in. Hin mijar hene ku hewce ne her kesê rewşenbîr li ser van gelek serêşiyay bikişîne û bi azîneyeke zanistî ji nava hev û din derxe û wan li ber ronahiya çavan raxe.

Birêz Zana Farqînî jî van xalên girîng yek hildabû dest û vekofîneke zanistî li ser bi kiribû. Lê ez di vê baweriyê de me wekî wî jî anîbû ziman, di vê xebat û çalakîyê de, divê rewşenbîr bi sînor nemîne û her ev lêgerîn û lekolîn bi berdewamî bê kirin, her wiha nivîsa me wê mîna dûmahîka nivîsa birêz Zana be û mijara wê dîsa zimanê xweserî zarokan be.

Ji zimanê zarokan î resen ezê çend gotin û peyvên pêşkêş bikim û dûv re ezê devoka Farqînê û Dêrika Çiyayê Mazî bînim cem hev û emê cudahiya di navbera devokan de bi hev re bibînin.

Pêşî em çend nimûneyan li ser belavkirina wan bidin: *Hela wele* (hela were), *bavo bivikê kir /eçî kir* (bavo li te xist), *kelê /kelo ezê te bitujim* (kerê /kero ezê te bikujim).

Her wiha mirov dikare hê jî zêde bike. Divê êdî em dest bi nivîsên û şîroveya binyada peyvên zimanê



xweserî zarokan bikin.

**Hozanî:** Dema mirov zarokan li ser stûyê xwe dike, an jî dibêje were ser stûyê min "hozanî"; "hozana" tê bikaranîn. Mînak: Were hozanî min, were hozana min.

**Hopanî:** Dema zarokên nû bi meşê dikevin xwe di dereke nizm de diavêje xwarê, ji wê yekê "hopanî", "hopana" tê bikaranîn.

**Ee:** Dema dayik wê /wî datîne ser piyên xwe ji bo ritîne "ee" tê gotin.

Mamoste Zana Farqînî ji devera Farqînê hin peyvên ji zimanê xweserî zarokan pêşkêş kirine. Em jî ji devera Dêrika Çiyayê Mazî eynî peyvên tînin cem peyvên devera Farqînê, ka em binhêrin çiqas cudahî di navbera wan de heye.

**Çûçê:** Wekî mamoste Zana anîbû zimên li devera Farqînê tê bikaranîn. Li devera Dêrikê di şûna peyva "çûçê" de "çûçî" tê gotin. Bi xwe ev peyv di wateya rûniştandinê da ye. Li devera Farqînê "eçê" bike, li devera Dêrikê "eçî" bike: Lê bixe lê bide, ango "eçê /eçî" di şûna lêxistinê de tê bikaranîn.


Li devera Farqînê "a kirin", "a ke", "lalî ke", "île ke", li devera Dêrikê "lolo" bike, "loî" bike. Ev gotin û peyv dema dayik zarokên xwe dike xewê, tînan bikaranîn.

Her wekî em ji nêzikahiya peyvên daveran jî têdîgihîjin, her çendî di peyvên de tîpek an jî du tîp cuda bin jî, di encama xwe de xwedî yek hîm û yek bingehê ne.

BIRÛSK ARJÎN

## Têkoşîna li hemberî bêdadiyê

CELALETTİN YÖYLER



**M**ijara me bi awayê "ola îslamiyetê" têkoşîna li hemberî bêdadiyê ye. Divê em baş bizanibin ku têkoşîna li hemberî bêdadiyê dagirkeriya nijadperesta çepel a li ser gelên bindest; wisa jî xwegorîkirina di riya qenciye û başiyê de hem jî alîkariya riya rastiyê û damezrandîna dadiyê ji bo bidestxistina mafên xwe yê mirovahî, (ewên ku bi ola îslamiyetê hatine biryardayîn û eşkerekirin), ferz e li ser her misilmanî. Hem jî ger pêwîst be bi "çek" divê ku doza mafên însanî bête meşandin. Ev tekoşînên bi vî rengî, bi awayê ola îslamê "cîhada ferz e". Çawa jî ku di pirtûkên fiqhê de jî hatiye nîşandayîn, wekî çawa ku Xweda di Qurana pîroz de jî wisa gotiye:

"Qey hûn guman dikin ku hûnê herine bihuşta Yezdan jî qet bi wan mirovên ku

di riya Yezdan de têkoşîn kiribin û bi wan mirovên ku li hemberî aşitan hevgerî bin, nizanibe?" Alî umran: 142

Dîsa jî Xweda ji bo wan kesên ku di riya rizgarkirina belengaz û bêkesan de, ceng û têkoşînê dikin, dibêje: "Ji bo we çî bûye ku hûn di riya Xweda de ji ber piştewaniya wan kesan zebûn bûne, ji mêr û jin û zarokên ku banzûrê Xwedayê xwe di bin û wiha dibêjin: 'Xweda yê me, tu me ji vî gundê ku gundîne wî cewrkar in derxe û tu ji me re alîkarekî ji bal xwe bişîne û tu ji me re bibe piştewan' qirênê nakin?" Nîsa: 75

Di vê ayeta pîroz de, Xweda ceng û têkoşîna di riya Xweda de ji bo rizgarkirina bêhêz û belengazan ji bin destê stemkar û mêtîngeran ferz kiriye.

Ê, jixwe Xweda di bingeha afirandina kesan de, têkoşîna ji bo pêgavên nûjen, bi taybetî damezrandîye. Ew kesê ku ji vî taybetîya hanê ya bi rûmet dîr bikeve, ew ji rewîsta xwe ya mirovahiyetê dîr dikeve. Ji ber ku navê wî jî mirov e, ne "teba û rawir e." A ji ber vê rewîsta wî ya hanê ya mirovahiyê, li ser wî pêwîst e ku pir tiştên qenc bike, ji bo mirovahiyê.

A bi vî awayî ola îslamê "ceng û

têkoşîna" ji bo rizgarkirina belengazan û bindestan ji bo parastina hemûçkên kesan ji tehdahiyên xişimkaran, ji şapatên stemkaran, bêdadiyên zordestan û her awayê dagirkerî û xwînmiyîyê di her demê û her warî de "ferz kiriye."

Di vê ayeta hanê ya pîroz de, Xweda qala wan belengazên ku ji Mekeyê koç kirine, ji ber stamkarî û bêdadiya kevneperestên koledarên stemkar dike. Lê her çiqas jî Xweda ji bo rewşa koçberiya wan kesan ew ayet şandibe jî, dîsa ji ayetên Xweda wateyên wan, sîper in ji bo hemûçkên bûyerên wekî wan. Ango jî bo hemû kesên ku li gerdûnê dijîn. Belê pir rast e: ayetên Quranê berê wan li tevayên kesan û gelan e, her çiqas jî li ser bûyerekekê di demên beriya niha de jî hatibin. Wateyên wan ayetan fireh in. Ango hemû bûyerên wekî wê bûyera ku ew ayet ji bo wî hatiye di nav xwe de digirin. Wekî çawa ev ayeta sûretê "Nîsa" a hejmar 75 li ser rewşa wan bawermendên belengazan e, ku kesên serdest ew belengaz kiribûn û tehdahî li wan kiribûn.

Nîşe: Ev nivîs ji pirtûka min a bi navê "Gelperwerî û Nijadperestî" ye, di nêzik de wê bê çapkirinê.



# Serokê Serhildana Bedlîsê

## Mele Selîmê Dimilî

**Çendekî berî Serhildanê Seyda derbasî Stenbolê dibe û bi Sultan Reşad re hin guftûgoyan çêdike. Bêguman ev li ser meseleya Kurdistanê ne. Li hemberî van, Sultan teklîfa paşatiyê lê dike. Lê Seyda wî napejirîne û teng vedigere welat, dîv re jî serhildanê li dar dixîne.**

**M**ele Selîmê Dimilî bi piranî bi navê "Seyda" tê nasîn. Ji ber vê yekê, ezê jî wî navî bi kar bînim. Di destpêkê de pêwîst e ku ez bibêjim, der barê jiyana Seyda de hê berhemên nivîskî pêk nehatine. Lê belê, di pirtûkên li ser dîroka Kurdistanê de nivîsên kurt li ser lebata wî hatine nivîsîn. Di vê nivîsê de, çavkaniya min a bingehîn neviyê Seyda û çend nasên wî ne. Ez vê bibêjim ku, ev jiyana hanê hêjayî, lêkolînê ye.

Seyda, di sala 1851'ê de li gundê Azîzan hatiye cihanê. Ev gund li ser Manîreş a Bawara Çewlikê ye. Ji eşîra wan re "Zikî" an jî "Siwêdî" (1) tê gotin. Bavê wî Mele Mehmûd, ji Darahênê (Genç) ya Çewlikê (Bîngol) derbasî Azîzan dibe û wî gundî ava dike. Piştî çend salên din jî wir derbasî gundê Qelencûxê dibe. Ew jî nêzikî Azîzan e.

Neviyên wî jî ve gavê di Qelencûxê de dijîn.

Mele Selîmê Dimilî, Serokê Serhildana Bedlîsê ye ku ew di sala 1914'an de pêk hatiye. Li ser vê yekê Kemal Burkay, di pirtûka xwe ya "Kürtler ve Kürdistan" de wiha dibêje: "Seyda welatparêzekî wekî bizot bûye."

Bi qasî ku ez jî pê agahdar bûme, taybetiya Seyda ya herî mezin welatparêziya wî ya xurt û zexm e. Ew di helbesteke xwe de wiha dibêje.

*"Bedek ji van kurdên me yê  
Aqil safîhê bêmeji  
Dujmin ku rast tê nakujî  
Belkî sibân xêr dide te."*

Seyda di biçûktiya xwe de li cem bavê xwe dest bi xwendinê dike. Dîv re bavê wî, wî dişîne medreseyê. Di vir de ilmê 'nehw û serf', 'şerîet û mentiqê' dixwîne. Ji vir derbasî Mûşê dibe û çend salan jî li wê derê dixwîne. Piştî ku jî Mûşê dizivire tê Qelencûxê, roje-

kê bavê wî dibîne ku Seyda li ber stûnê rûniştiye dixwîne û hebên genim yeko yeko ji stûnê ve ber bi jor hildikişîne. Li ser vê yekê bavê wî, ji ber ku melayekî sofî bûye, dema ve yekê dibîne, pê re dixeyide, şimaqekê lê dide û wî ji malê dike der. Seyda ji malê dîv dikeve û diçe. Piştî ku jî vir diçe, berê xwe dide Misirê. Li wir şex salan dimîne, di "Camîetul El- Ezher"ê de dixwîne. Dema wê diqedîne, derbasî Îranê dibe, li wir jî çar salan di Medreseya Ayetullahan de dixwîne.

Ew piştî çûyîna xwe ya panzdeh salan bi şûn ve vedigere gundê xwe. Ew pênc salên din nayê zanîn ku Seyda li ku derê bihurandiye. Bi qasî demekê li gund dimîne, paşê derbasî Bedlîsê dibe û li wê derê tîkiliyên wî bi Mala Xews re çêdibin. Kurê Xews, keça xwe dide Seyda û ew xelîfetiye jî Mala Xews distîne. Her wiha li Bedlîsê di Medreseya Mezin de dest bi dersdana feqîyan dike. Di nava feqîyên wî de kurê Xews Şêx Şehabedîn, birayê wî M. Şîrîn û Bedîüzeman Seîdê Kurdî jî hene.

Feqîyên Seyda li Qelencûxê jî hene. Di Qelencûxê de çar heb çêlekên Seyda hebûne û Seyda feqîyên xwe jî bi xwe xwedî kirine. Tê gotin ku Seyda havînan li Qelencûxê maye, zivistanan jî çû-

**P**irtûkeke wî heye ku ew niha di medreseyên Patnosê de ye. Ev pirtûk destnivîs e û bi kurdî hatiye nivîsandin. Tê gotin ku, naveroka wê li ser zanîna asîman (astronomî) e û pir babetên hêja hene. Ji xeynî vê pirtûkê jî, hin name û nivîsên wî yên kurt jî hene.

ye Bedlîsê. Dema ku hatiye Qelencûxê, Şêx Şehabedîn û M. Şîrîn jî bi xwe re anîne (2) Dema em mêze dikin, em dibînin ku di serhildanê de jî, hetanî şehadetê ev her du bira li cem Seydayê xwe bûne û jê neqetiyane.

Di vir de pêwîst e em tiştekî din bibêjin ku, birayê Şêx Şehabedîn yê mezin Seyîd Elî, (bapîrê Kamiran Inan) di vê serhildanê de piştigiriya serhildanê nake. Lê belê xwe ji bend jî xelas nekirîye. Dema ku wan dibin ber bend, Seyîd Elî wiha dibêje:

"Heger ku min bizanibûya Rom ew qas bêbext e, heta ku dinya hebûya wê hestiyên leşkerên Romê ji Geliyê Zilan safî nebûna."

Belê, van gotinan dibêje, lê êdî gotinên pir derengmayî ne û bi kêrî tiştekî jî nehatine.

Li ser bûyereke Seyda û Bedîüzeman, di kovara "Dava" de tê gotin ku; Seyda rojekê ji hecê tevî hevalên xwe dizivire û di Şamê re derbas dibe. Ên pê re dibînin ku li Mizgefta Mezin cemaeteke mezin li hev ciyîyaye. Seyda di-pirse: "Ev çi mesele ye?" Ên li cem wî dibêjin: "Bedîüzeman li vir weazê dide." Û jî Seyda dixwazîn herine wir. Lê belê Seyda ve napejirîne, wiha dibêje:

"Mele Seîd ji ber min radibe û rûmetê nişanî min dide. Ev yek jî sehwa wî li hemberî cemaetê sivik dike. Ji ber ku ew bi rewşa min nizanin."

Her wiha di san rîya xwe didomînin. Belê, Seydayê Mele Selîm filozof û pêşengekî kurd e. Ev yek di tevger û şopa wî de tê dîtinê. Ez di wê baweriyê de me ku, heger pirtûka Seyda çap bibe û der barê jiyana wî de tiştên mayî derkevin holê, emê di dîroka Kurdistanê de kesaniyeke cihêreng û nû bibînin. Pirtûkeke Seyda heye ku ew niha di medreseyên Patnosê de ye. Ev pirtûk destnivîs e û bi kurdî hatiye nivîsandin. Tê gotin ku, naveroka wê li ser zanîna asîman (astronomî) e û pir babetên hêja hene. Ji xeynî vê pirtûkê jî, hin name û nivîsên wî yên kurt jî hene. Di san helbesta "Pîra Torê" angû "Hilkişîme çûme jorê, herdu rex min bend û rez.." jî, di nava

nivîsên wî de ye. (Herêma Torê, di navbera Bedlîs û Sêrtê de ye.)

Ez di vê nivîsê de li ser pêkhatina lebata serhildanê nasekinim. Lewre ew bi serê xwe babeteke kûr û dirêj e. Hewceyî lêgerînekê cuda ye. Lê bi kurtasî be jî, du xalên ez bêjim hene:

Çendekî berî Serhildana Seyda derbasî Stenbolê dibe û bi Sultan Reşad re hin guftûgoyan çêdike. Bêguman ev li ser meseleya Kurdistanê ne. Li hemberî van, Sultan teklîfa paşatiyê lê dike. Lê Seyda wî napejirîne û teng vedigere welat, dîv re jî serhildanê li dar dixîne.

Di san ev serhildan bi rêxistineke xurt e û di vê rêxistinê de, pêwîst e em bibêjin ku kesên wekî Xalidê Cibrî, Yûsif Ziya û Şêx Seîd jî hene. Heta tê gotin ku, çendekî piştî îdama Seyda, Xalidê Cibrî û Şêx Seîd li nêzî Mûşê rastî hev

tên, ji dil û can hev û din hembêz dikin û wiha dibêjin:

"Me Seyda jî wînda kir, biserketina me êdî zor e."

Pêwîst e ku em bibêjin di dadgehê de dozgerên osmaniyan pir li ser disekin ku Seyda înzeya xwe înkâr bike û her wiha ku ew wî îdam nekin. Lê, Seyda wiha bersiv dide wan: "Ka bidin ez lê mêze kim" (ji bo înzeya xwe dibêje). Dema dibîne ku înzeya wî ye "Belê belê, min ew bi van destikên xwe avêtîye", dibêje.

Dema serhildan dişikê, Seyda û çend hevalên xwe di balyozxaneyê Üris de li Bedlîsê dimînin. Ew û rêveberên dewleta Üris li ser çûyîna wî ya Ürisê gelek guftûgoyan dikin. Ew, bi şertên ku Seyda li wir perwerdeyê neke dipejirînin ku ew here Ürisê. Lê belê Seyda jî bi wî şertî dixwaze biçê wir ku ew li hemberî xebatên wî yên perwerdehî û rêxistinî nasekinin, da ku ew karibe bigel re bi hêsanî tîkiliyê deyne û bi wan re bipeyive. Li ser vê yekê li hev nakin.

Di vê demê de pêvajoya Şerê Cihanê yê Yekemîn e. Hêzên dewleta Osmanî jî ve derfetê dibînin û bi awayekî bêbextî dikevin balyozxaneyê. Seyda bi hevalên wî ve digirin û wan dixeniqîne. Piştî şehadeta Seyda, du heb kurên wî di Hepsâ Mûşê de girtî ne. Her du jî, ji aliyê osmaniyan ve bi jehrê tene qetilkirin. Du lawên wî ku hîna 7-10 salî ne û bi jina wî ve sirgûnî bajarê Bursayê dikin. Zarokên wî 7 sal bi şûn ve vedigerin welat.

Bêguman ev nivîsa hanê bi serê xwe jî bona berçavkirina ve jiyane pir kêr e û tere jî nake. Lê ji bo lêkolîn û lêgerîneke nû mirov dikare wekî destpêk bihesibîne.

1) Li ser vê eşîrê binêrin; Şerefname Beşa sisiyan.

2) Di Qelencûxê da bexçeyê Seyda heye. Wî xebatên xwe li wir meşandine. Ev bexçe niha jî heye û pir cure darên fêkiyan tê de hene. Jê re dibêjin "Bexçe Seyda" û ev bexçe di destê neviyên wî de ye.

**Têbînî:**

Seyda bi çend navên cuda tê zanîn. Li Misirê "Selîmê Şerqê", li Kurdistanê jî "Xelîfe Selîm" û "Seyda".

RUSTEM BAD





- 5.1.1984 Rewşenbîrê kurd Tewfîk Wehbî çû ser heqîya xwe.
- 6.1.1985: Konferansa Zimanê Kurdî ya Navneteweyî pêk hat.
- 7.1.1941: Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li Îranê ava bû.
- 8-21.1.1995: Kongreya Serkeftinê ya Pêncemîn ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) pêk hat. Di vê kongreyê de gelek biryarên girîng hatin girtin. Yek ji van biryaran jî guhertina ala partiyê bû. Di vê kongreyê de das û çakûç wekî nîşana sosyalîzma berê hate binavkirin û ji alê hate derxistin.
- 9'ê rêbendanê: Vê şevê rojîya misilmanan a meha Rezemanê dest

pê dike. Rezman peyveke bi erebî ye. Ji peyva pir germ, an şewitînê tê. Li gorî hinek aliman, guneh di vê mehê de bi saya rojîyê dişewitin. Ji ber vê yekê ev nav stendiye. Rezman meha dawî ya sêmeha e. Mehên beriyê Rezmanê Recep û Şeban in.  
 Rojîya Rezmanê li ser kesên misilman û reşîbûyî yên hişên wan li serî ne, ferz e.  
 "Ez bênan dikarim bijîm, lê ez bêazadî nikarim bijîm"  
 gotina Seîdê Kurdî (Bedûzeman Seîdê Norsî)  
 ● 11.1.1992: Rêveberê Partiya Keda Gel (HEP) ê Batmanê Tewfîk Bazitçî ji aliyê "hêzên tarî" ve hate kuştin.

AWIR

# Rûyê rastîn ê sazûmanê



**Filmê "Dîwar" li ser jiyana mirovên ku li keviya jiyane dijîn radiwaste. Çiroka film bi giştî li rewşa girtiyên dema derbeya 12'yê rezberê û nemaze jî li ser rewş û jiyana girtiyên zarok hatiye honandin.**

Saxa Navend a NÇM'ê ya Stenbolê bi çalakiyên xwe yê hunerî dilê mirovan geş û mêjiyên mirovan ronidar dike. Beşa Hunerên Dîtbarî ya NÇM'yê di 27'ê berfanbarê de, filmê "Dîwar" pêşkêşî hunerhez û sinemaperweran kir. Wekî tê zanîn derhêner û senaryonivîsê film Yılmaz Güney e û ew di sala 1984'an de li Fransayê hatiye kişandin. Îro jî, hê bi awayekî fermî nîşandana "Dîwar" li sinemayên Tirkiyeyê qedexe ye.

Filmê "Dîwar" li ser jiyana mirovên ku li keviya jiyane dijîn radiwaste. Çiroka film bi giştî li rewşa girtiyên dema derbeya 12'yê rezberê û nemaze jî li ser rewş û jiyana girtiyên zarok hatiye honandin. Di film de zordarî û lêdana gardiyanan a li ser zarokan bi şeweyeke têkûz û zelal tê nîşandan. Wekî listikvan Şaban, Ziya, Gardiyan Cafer û Ali Emî (T. Kurtiz) balê dikişînin ser xwe. Di demsala zivistanê de girtiyên zarok rojên xwe bêsope didomînin, razingeha wan bêpace ye û ew zarokan ji bo daxwazên xwe yê cinsî bi kar tînin, spî dikevin canê wan. Îşkenceyên ku li wan tên kirin bi riya hoparlorê li hemû girtiyên zarokan tê belav kirin. Zarok ji mirovên ku nenas in re wekî bavê xwe nameyan dişînin.

Film bi serketina mirovên baş û bîndest neqade. Zarok ji bo ku ji girtigehê birevin, planan saz dikin. Lê Şaban û Ziya bi awayekî bêplan di roja xebatê de birevin, Şaban tê kuştin, Ziya xelas di-

be. Lê di demekê kurt de ji nû ve tê girtin û di girtigehê de bi îşkenceyê tê kuştin. Beriya mirina xwe Ziya gotinên film yê herî hêja dibêje: "Hevalino min kûçikê xwe nedît. Ji bo me jiyana li her derê qediyaye, li tu deran ji bo me bexteyarî nîn e." Piştî wan bûyeran girtî ji bo ku gardiyan Cafer bikujin, dixwazin serhildaneke pêk binin. Lê serhildana wan tê bihistin û têk diçe. Gardiyan Cafer jî ji mirinê xelas dibe.


Di film de beryî nîqaş xala herî balkêş û hêjayî pesnê listikvanên zarok in ku cara yekemîn di filmekî de rol digirin. Ew qas baş û tekûz rol girtine ku mirov carina xwe wekî girtiyekî ku di girtigehê de dijî, dibîne. Çêr û dijûnên kûçeyî bi hemû zelalî û tazîtiya xwe di film de tên bikaranîn.

Her wiha bi awayekî di ser re li ser rewşa girtiyên siyasî jî tê rawestîn. Piştî temaşekirina film, ev gotina nivîskarê hêja Dostoyevskî tê bîra mirov: "Hezkirina zarokan, hezkirina jiyane ye." Ji bo sazûmanekê nîşana rizîne ya herî berbiçav îşkence û lêdana zarokan e. Tiştê ecêb û elewêş jî, zarok di girtigehan de "kedi" nabin û ji berê baştir dibin diz û esrarkêş. Her wiha, nîşana herî zelal ya demokratîkbûn û mirovaheziya dewletekê rewşa girtigehan e. Ji ber ku girtî ji bal û çavên raya giştî dûr in û bêberewani ne, perçiqandina wan mirovan gelekî hêsan e. Me rengê demokrasiya tirk li Amed, Buca û li Ûmraniyeyê dît.

EŞREF SÎDAR

# ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YIĞIT



## Rojnamegeriya kurdî (1)

Salên piştî 1990'î bi awayekî salên rojnamegerî û rojnamevaniya kurd in. Rojname û kovarên mîna Yeni Ülke, Welat, Gündem, Politika û hwd. di van salan de çavên xwe vedikin. Rojnamevanî û rojnamegeriya kurd aktîv û geş dibe. Di nav giş şaxên fikrî û edebî de bi ser dora xwe dikeve. Bi ferqekeke berçav li nava xwe û şaxên din vedike. Mîna ku bibêje hilnîn ji ber min, xwe bidin alî ez pê li kesî nekim, ji dawîya karwên ber bi pêşî de dilezîne. Yek bi yek bask û refên bi rê de derbas dike. Şeqla xwe li hafiza gelê kurd dide û di nav rojnamevaniya cihanê de dibe xwediyê cihekî nejbîr û birûmet.

Di nav çend salan de rojnamegeriya bi her cureyî; rojane, hefteyî, pazderojî, nêlanê û demsalî bejn dide.

Ev rojnamegerî bi cesaret û serbilindiyê hêjayî pesnê, bi berpîrsîti û sextiyê ku dilê mirov dibijiyê, bi naverok û formeke pîralîtîr, bikalîtetir û ji awira neteweyî ve Kurdistanîtir, radîkaltir û rasterasttir, bi berdêleke giran rola xwe dilîze û ji bo her kurdî dibe wesîla serbilindahiyê. Riya rojnamevaniya xelkên din di dehsal, bîst sal û pênc salan de dimeşe, rojnamevaniya kurd di 9-10 salên bihurî de dibirre û mîna rojnamevaniyê alternatîv û muxalîf di nav rojnamevaniya cihanê de balê dikişîne ser xwe.

Heger em îro ji tiştên li ber çavan e, ber bi sala jidayikbûna rojnamegeriya kurd de herin, em rûpelên dîroka rojnamegeriya kurd biqulîpînin û bîr ser rojnameya Kurdistan, damezrêner û berdevamkarên wê û em jî wir careke di bizivirin bîr îro, em bi rê de çavekî biavêjin birêveçûna 98 salî, em dê bibînin ku rojnamegeriya kurd hê ji roja ewil de di nav dijwariyên kuşinde de çavên xwe vedike. Di nav şertên nelibar de gavên yekemîn diavêje, kevîrên ewil datîne û rêzên destpêkî dineqîşîne.

Di van rojên çêbûn û berşîriya xwe de, rojnamegeriya kurd bêcih û bêwar e. Ne adres û ne navnîşan e. Her kêlî bi mirinê re rû bi rû ye. Li sirgûnan û li ber deriyê xelkê ye. Di nav metirsî û bêaramiyê seraqet de ye. Welat û bajar diguhere. Geh li deriyê ve çapxaneyê û geh li deriyê ya din dide, Li dû hev çapxane û navnîşanan diguhere. Berpîrsî û îmzeyan diguhere. Gerok e. Seyar û bi rê de ye. Di nav erd û ezmên de diçe û tê. Li cihekî lê bistire, li hêlîneke ku lê bi cih bibe û li bihostek axa ku li ser şehda xwe bîne bi salan digere. Rojê li vir e û çar rojan li dera han e. Ne hedan e, ne tebat e. Cih ji mar re heye, ji wê de tune ye. Ev cih carinan Misir e, carinan Siwîsre ye û hin caran jî Îngilistan e. Tim ketiye û rabûye rojnamegeriya kurd. Di nav erdekî tije bombe û dijmin de, di nav xwîn û xwêdanê de li jiyane geriyaye, bi ser piyan ketiye û gihaye îro. Bêkesitî û bêxwedîtî dîtiye. Kezebî nas kiriye. Qiriktehlî nas kiriye. Rojên mîna kerafiyê, salên mîna zilindarê spartine hev û bûye xwediyê serpehatî û ezmûneke dewlemend.



**Koma Gulên Xerzan, komeke Navenda Çanda Mezopotayayê (NÇM) ye. Xebatên xwe li Stenbolê didomîne. Heta niha kaseteke wan derketiye. Hevalê me**  
**AZAD ALTUN**  
**bi endamê komê re der barê muzîka kurdî ya otantik de peyivî û ji wan nêrîn û ramanên wan ên li ser muzîkê pirsîn.**



# Gerek e em şerê li welatê xwe bînin zimman

**E**m dixwazin pêşî jî Çiya dest pê bikin, we çawa dest bi stranbêjiyê kir û kengê?

● Navê min î rastîn Selman Şenses e, yê kurdî jî Çiya ye. Ez ji qezaya Misircê (Kurtalan) me. Li wê derê min stranbêjî dikir. Em diçûn dawetan.

Malbata me di sala 1986'an de hate Stenbolê. Wexta em hatin Stenbolê jî min ev kar domand.

Di nav gelê de jî em zehf dihatin naskirin. Muzîka ku me çêdikir gel pê xweş bû. Min bi xelkê re stran digotin, bi pereyan me tembûrvan digirtin, ji me re li tembûrê didan, li elbaneyê didan. Demeke dirêj em bi vî awayî xebitîn. Ez fikirîm ku êdî bêkom nabe.

Divê tu gavên mezintir biavêjî, me rabû li wê derê di sala 1990'î de kom avê kir. Em diçûn dîlanan, şahiyên. Di sala 1991'ê de me kasetek li Unkapaniyê, bi navê "Ji Bîr Nabin"-çê-

kir. Pişt re em li ser fikirîn, me lê nîhart ku bi giranî ne muzîka kurdî ye. Zêdetir bi darbûqayê û enstrûmanên din bû. Serkar û derhêner li gorî xwe çêdikir. Yanê li gorî piyaseyê.

Me di 1992'an de gaveke mezintir

NÇM'ê kir. Her tiştê wê xelas bûbû, tenê wê li fabrikayê bihata zêdekirin. Hevalên sazband û hunermendê yên saziyê lê guhdarî kirin, xebata me baş nehate dîtin û ji me hate xwestin ku em ji nû ve li serê bisekinin. Me

girt, bi rastî berê jî em di nav gelê de dihatin zanîn.

Mesela, li NÇM'ê beriya Koma Çiya, Koma Amed, Koma Azad bangî Gulên Xerzan dikirin ji bo barmeyan û dawetan. Tercîha yekemîn Koma Gulê Xerzan bû. Lê komên ku min li jorê jimartin, ji me bêhtir pêşketî bûn, di warê perwerdehiya notayê de, di warê zanîna muzîkê de û hwd. Me jî nedixwest ku em xwe derxin pêş. Bi me re zanîna nota û muzîkê nîn bû, lê îro em ne wekî dohin.

Hevalê Mistafa hat kete komê, berê ew jî di Koma Dilbirîn ya NÇM'ê de dixebitî. Ev kom belav bû. Hevalê me Hesên kete komê. Îro em dizanin û dikarin muzîka gel, hem bi firehî û hem jî wekî hemdem çêkin.

*Di komê de çend kes cih digirin?*

● Di komê de 4 kes hene. Wexta em hatin NÇM'ê em sê kes bûn.

**X**westina me ev e ku em der heqê muzîka kurdî de tiştên xweş bikin. Ji dîroka gelê kurd û ji jiyana Kurdistanê mirov dikare bi têsîr bibe û muzîka xas a kurdî çêke. Li xerîbiyê, ji jiyana metropolê derxistina muzîka otantik a kurdî tiştêkî zor e. Mesela tu otantîka kurdî zeft jî bikî, di muzîkê de çênabe

avêt, me got eger em muzîka kurdî çêdikin, îro bêyî Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) nabe. Ji bo ku em xwe bi pêş ve bibin û di warê hunerî de xwe bigihînin, ev yek pêwîst bû.

Gava em hatin NÇM'ê me kaseteke xwe ya amadebûyî pêşkêşî

jî ew kaset dernexist.

Di sala 1993'yan de me kasetaya xwe ya pêşîn bi navê "Ji Bîr Nabin" bi stranên bi navên Felekê, Kamûran, Botan, Xayin ku me lê zêde kiribûn, pêşkêşî gel kir. Stranên ku me di kasatê de gotibûn, di nav gelê de dihatin zanîn. Ji wê yekê me zû cih



Hûn bi taybetî şekl û qalibên muzîka kurdî bi kar tînin, an ji ber xwe çêdibe?

● Em dikarin bibêjin bi piranî, lê di her stranê de ev taybetî nîn e. Mesela, em bêhtir stranên gelêrî bi kar tînin. Ev taybetî di van de heye. Em îro bi rengê otantik em wan stranên çêdikin û dibêjin, wekî din em melodiyên kurdî distirên. Wekî strana Mişko û strana Dara, ku komê ev çêkirine.

Berîya şed salan stranên ku hatina gotin, stranên ku di civînên gel de hatine zimên, îro em ji nû ve pêşkeşî gel dikin da ku em toreya wan bi wan bidin zanîn.

Hûn di xebatên xwe de rengên otantik çiqas bi kar tînin?

● Belê ne tenê em xebatkarê komê, hemû kurd di warê şexsiyete de hatine parçekirin. Ji ber sirgûnan, şewitandina gundan, revandin û kuştina însanan gelek hunermend û stranbêjên kurd hatine welatekî xerîb. Bi vê psîkolojiyê, çêkirina muzîka otantik pir zehmet e. Bi qasî ku ji destê me tê, em li ser çand û hunera

ma Gulên Xerzan, Çiya me. Di sala 1992'yan de ez ketim komê. Bi rastî hevalan jî anîn zimên, wexta ku em berî bîn NÇM'ê, di warê muzîkê de em ew çend ne pêşketî bûn. Piştî ku me di xebatên NÇM'ê de cih girt, ji aliyê şexsiyete ve û ji aliyê muzîkê ve pir guherîn çêbûn. Berî nîha me nizanibû bi notayan em stranên çêbikin. A nîha em bi notayan stranên xwe çêdikin. Me bingeha muzîka kurdî nizanibû, lê wexta ku mirov dikeve saziyêke birêxistin ku gelekî îfade dike, li ser çand û huner û muzîka vî gelî têkoşinê dike, hûn bibêjin guherîneke çawa wê bibe...

Li ser wê pirsê tu çi difikirî. Bi kurtayî tu karî bibêjî?

● Berî her tiştî di şexsiyata me de guherîn çêbûn, di dîtina me de guherîn çêbûn, di têkoşina muzîka kurdî de NÇM'ê rê bi ber me xist. Îro her çiqas dengê me xweş be jî, gava di xebatê NÇM'ê da cih negirim belkî kes li me guhdarî jî neke. Bîr û baweriya min zexmtir bû.

Li welat şerek dibe, gerek e em vî şerî jî bînin ziman. Tiştên siyasî û

Di piyaseyê de muzîkên wekî caz û pop hene, gelo hûn li gorî tercîhên gel muzîkê çêdikin an...?

● (Mistefa) Ez dikarim wiha bînim ziman, mirov gerek e bi demê re bimeşe, lê îro gelê me ne azad e. Ji ber wê qasê ji popê hez nakin. Ji cazê hez nakin. Ji arabeskê hez nakin, em bi xwe ji muzîka gel zehf hez dikin û di hêlê de jî, berî NÇM'ê bi vêdeh salan jî xebata me li ser muzîka gelêrî bû.

Muzîka gel çanda me ye, çandeke kevnare ya neteweyî ye û em jî çêtir pêwîst dibînin ku li ser muzîka gel bisekinin û muzîka gel çêkin.

Bi rastî em mereqa tiştêkî dikin. Ji me kirî ku hûn ji herêma Mêrdînê ne, lewma navê komê ji me re hinek balkêş dihat. Em disa bipirsin çima Koma Gulên Xerzan?

● (Çiya) Me jî ji xwe pirsîye, bi rastî tiştêkî girîng e, gel jî ji me dipirse. Di sala 1990'î de şerekî zehf dijwar ji aliyê Sêrtê ve dest pê kir. Wê çaxê Serokê neteweyî baang kir got: "Herema Misircê gula Xerzan e." Berê, em bînav derdiketin. Piştî

Muzîka kurdî bi ya we îro gihîştî ye çi merhaleyê?

● (Çiya) Dengbêj hebûn, van dengbêjan zilma ku li kurdan bûye hemû bi dengbêjî, bi stranî anîne ziman. Ku em vê gavê binêrin, wê demê deh însanan di nav xwe de bahsa Kurdistanê kirûbana wê ji aliyê hin kesan ve bihatana daleqandin. Lê îro hin tişt hatin standin, em dikevin demeke wisa ku muzîka kurdî di cihanê de deng bide. Berê di muzîka kurdî de ors, piyano, gîtar nîn bûn. Îro ev hemû enstrûmanên tînan bikaranîn. Ji vî kifşê ku muzîka kurdî ji ya doh pêşketîtir e.

Asteng û pirsgirêkên li ber we çî ne?

● (Mistefa) Bi rastî astenga li ber me dewlet e. Berhemên ku em dertînin, dest datîne ser, nahêle bîn firotin. Ji ber vî yekê pirsgirêkên aborî dertên holê. Ji bîr pirsgirêka aborî em nikarin berhemên xwe pêşkeşî gel bikin.

Di pêşerojê de ji bo muzîkê çî amadehiyên we hene?




Rojda



Hesên



Çiya



Mistefa

gelê xwe ya otantikê dixebitin û em lê dixebitin ku em wan taybetiyan bi kar bînin.

Tiştêkî din jî heye, çavkanî û xebatên lêgerînê yê der heqê muzîka kurdî de pir kêmtir in. Ji ber ku kêmtir in jî em nikarin feydeyekê jê bistînin.

Xwestina me ev e ku em der heqê muzîka kurdî de tiştên xweş bikin. Ji dîroka gelê kurdî û ji jiyana Kurdistanê mirov dikare bitêstir bibe û muzîka xas a kurdî çêbibe. Li xerîbiyê, ji jiyana metropolê derxistina muzîka otantik a kurdî, tiştêkî dijwar e. Mesela ta otantîka kurdî zêft jî biki, di muzîkê de çênabe. Mesela, di baxlamê de tîniyên kurdî hê nehatine dîtin. Tîniyên di muzîka alewiyan de tînan bikaranîn.

Piştî ku Koma Gulê Xerzan di nav xebatên NÇM'ê de cih girt, çî guherîn çêbûn?

● (Rojda) Ez xwişka avakerê Ko-

politîk bînin ber çavên gel. Em divê stranên gel jî bibêjin. Stranan li ser şehîdên Kurdistanê bibêjin. Bi hunera xwe gerek em pêşkêşiya vî tiştî bikin.

Disa jî gelek aliyan ve guherîn çêbûn. Mesela, berê stranên ku me çêdikin, me jî kesî nedipirsî, yanê ev stran çawa ye, rind çêbûye an na. Lê îro strana ku em çêdikin, gel tê dibêje, ev stran wiha bû, te çira wiha got, meselek tê de heye. Ji ber vî yekê îro stranên ku tînan çêkirin li şer bingeha wê bi dorfirehî tînan sekinandin. Ev çawa çêbûye, li ser çî hatiye gotin, çawa hatiye ziman... Bi wî awayî em êdî li ser disekinîn.

Wekî ku Rojda jî anî ziman. Me bi notayê nizanibû, bi harmoniyê jî, lê îro hindik be jî em hîni wan bûn. Guherandina baweriya di warê muzîkê de pir çêbû, îro em dibêjin muzîka kurdî gerek e bibe navneteweyî; hemû cihan pê zanibe.

wî, gel û şervanan gotin ku bila navê koma we Koma Xerzan be. Me got na, tenê Xerzan nabe, bila Koma Gulên Xerzan be. Ne ku em ji Sêrtê ne lewma bi taybetî me ev nav hilbijartîye.

Kasetên kurdî yê bi mantiqa ticarî tînan weşandin, astengan li ber we derdixînin an acizbûna we ji vî heye, hebe çî ye?

● (Hesên) Kasetên ku li derve tînan weşandin tesîra wan li ser me zêde çênabe. Hozanên ku kasetên wan tînan weşandin divê mirov li jiyana wan binêre.

Di bîr û baweriya gelê kurdî de hozanê ku êvaran here pavyonan, di bin lempyên loş de strana bistrê, bi roj jî li ser navê şehîdên Kurdistanê stranên bibêje, nayê qebûl kirinê.

Wekî di jî li ser bergên kasetan bi taybetî rengên me yê neteweyî bi kar tînin. Ev me zehf aciz dike.

● Em xebatên xwe li ser taybetiyên muzîka kurdî û ji bo naskirina wê didomînin. Ji bo kasetaya duyemîn em dixebitin. Stranên ku em bibêjin pîr in, yanê ji stranên ku komê ew çêkirine, em dikarin ji wan sê, çar kasetan jî çêkin. Em vî jî dizanin ku kasetaya me derkeve wê gel me baştir nas bike.

Koma Gulên Xerzan ji tembûr, elbane (def) û ûdê pêştir, îro dixwaze enstrûmanên wekî ney, keman, piyanoyê jî daxilî komê bike. Em dixwazin muzîka ku bi piranî xortan rake ser piyan, wan bikişîne têkoşinê çêkin.

Kasetaya me ya duyemîn amade ye, jî ber astengiyên aborî em nikarin bikevin stûdyoyê.

Di rojên pêş de eger pirsgirêkên aborî rabin di navbera 3-4 mehan de emê kasetaya xwe ya duyemîn pêşkêşî gel bikin.



# Têkçûna Ehrîman

**Tûfana ku di giyanê gel de rabû, bi arama gel a dilop bi dilop ji kedê hafî honandin, hedinî. Û gel dike ku dizên nasnameyan di dojeha ku bi janan hatiye afirandin de bihelîne.**

**E**wên ku di hênika hiyeke bêhnşemamokî de li ber hêtekî nivxerabûyî bi destekî kevjalî mêjiyê wan tertûbelabûyî, niha xwedî zarokên dehsalî ne. Ew xerzikên ku bi hilma wan a barûdî bûbûn wekî rijiyê, niha li ber fêkîdayîne ne. Ew zarokên ku ji tirsî siya we kabûs û taya mirinê vedireşyan, niha mil bi tiving û xweşleheng in.

Gelek berf bariya li wan çiyayên ku bi hêrsa potîna we hatin sotin. Hemû lawir, dar, hêşinayî, bi kurtî hemû giyandar ji îrada we re destbirak û pismam in.

Tofana ku di giyanê gel de rabû, bi arama gel a dilop bi dilop ji kedê hafî honandin, hedinî. Û gel dike ku dizên nasnameyan di dojeha ku bi janan hatiye afirandin de bihelîne.

Du bend hebûn. Du bend çûne hev bi şûrên bayî. Xwedî şûrinen dilçerm bi bin ketin. Hinek bi bin serdadê ketin. Hin jî bi ber bê ketin. Hem çiya disotin, hem serad didan ber avê. Çiya vedijenî dîsa, lê serad..

Çûkan bi yek carê bar kiribûn, ji ber



dek û dafikên xwedî rîpên osmanî. Lê war tune bû, warê damankirî. Çûkê li ser hej e. Çiqas kulîlkên ku hebûn lal bûbûn, dayikan jî jan bi tenûrê vedidan. Jan pê ve didan, lê lawij vedîçinîn.

Hunermendê nerindiyê şoqila mirina zer diçand û çeteyên reş-qoqî diçinîn. Ji bêhna xezeba Xwedayê nerindiyê, Xwedaya spehîtiyê revî cihê herî bilind yê çiyayê bêhnşemamokî. Destên bajar û gundên reşgîrêdayî ber bi jor

de, çiyayê lawijê ziz dikir. Lawijek ti jî hawar û bi hêviya evîneke seranser Memî. Bostek xak nema ku çêrek hêstir li ser nerijiyabe. Şitlek nema ku dilopek xwîn neniqutibe ser. Êdî çavên sosinan nexwestin werin daxkirin di sehereke dilrevîn de. Dîsa dibêjim ew çûk çiqas xweşik bûn, ka bi kû de çûn. Kengî vedigerin lîs. Qey hacîreşkan kenêzarokan yê bîhokî jî bi xwe re birin.

Wexta ew bi gulokeke jehra ji firokê

hate avêtin perpitûn û gorek ne diyar di nav nêrgîz û beybûnên çavgiryan de ji wan re bû çîsmet; hêj berbang ne avis û gel strana serkeftîneke soring nelorandibû. Girêka kor vedîçire. Derew bûne berfa li ber tava tîrmehê. Hurmuz, bi şûrê aştiyê û bi rimê azadiyê li ser pişta hespê rehwan yê rûmetê bi çargavkî tê û xwedayê nerindiyê Ehrîman, wê di nav tîfê de sobariyê bike...

HESEN ZINAR

## Ji Seydayê Kûso çend helbestên bijartî

### Xewn

Li keviya xeribiyê rûniştî bûm vê êvarê dilê min bi hîvê re gelagel dikir, hîv gelek westiyabû.  
Min ew hemêz kir wek zarokê berşîr  
Hîv, di destên min da bû gulek  
Ezmên, asoyê xwe teng kir.  
Brûskeke reş gula min revand ji destên min.

Av ji xewan rabû  
Baran ji ezmanê wek kêr û xerçer  
Barî ser serê me.  
Êş û xengîniya me bû hawarek  
Bawara me bû bayekî dîn û har.

Hîn payiz nehatibû,  
Hemû pelgên daran ketibûn erdê  
Xwe gihandibûn behran  
Me ji şevê tîka kir  
ku tavê ji bona saetekê bibexşîne me.

Me dayika xwe, ji erdê pirsîya:  
"Avên te gihîştin ser ewran,  
lê tu deng nakî  
çima te şev dereng nexistin?"

Bayê Helepçe yê zer em di xewê de girtin,  
Tirbek tijî gulên li kêlêka me.  
Dîsa ewrên reş radibin..  
Kîjan gund tê şewitandin?

Kîjan zarok sêwî man?  
Kîjan bû..  
Kîjan dayik..  
Gelo, delala min jî niha tev li wan e?  
Her tişt hişk bû  
wek kulîlkên çilmisî.  
Ez rastî egîdan hatim  
egîdên ku hîvên rûşewitî li dû xwe kaş dikirin..

### Seredan

Di şeveke reş de  
ba çû seredaniya baranê  
Di rê de rastî ewran hat  
Yên ku ji baranê qeheribûn  
ji ber ku wê xwe guhertibû teyrokê  
û ronîya hîvê gemar kiribû..  
Dilê ba şikestî ji ber kirina baranê..

Ba vê carê ket ber seredaniya berfê  
di rê de rastî daristanekê hat.  
Yê ku li hember mirinêbû  
wî nedikarî êdî bihna xwe hilde  
ji ber ku berfê xwe guhertibû heriyê  
û li ser wî baribû..  
Dilê ba şikestî ji ber kirina berfê.

Ba çû seredaniya tavê  
di rê de rastî deriyayêke miçiqî hat.  
Ya ku bi tîrêjên tavê hatibûn ziwakirin..  
Dilê ba şikestî ji ber kirina tavê.

Ba biryar da  
vegeriya mala xwe.  
Di xewa xwe de  
xwe guhert tofanekê  
hêvidariya dinyayekê kir  
dinyayekê  
tijî aşî  
tijî hevaltî  
tijî azadî

### Li wê derê

Li wê derê  
tenê deng û sewta dilê tariyê dihat.  
Li wê derê,  
avên behran kêlekên xwe ramûsîn  
û ji hev xatir xwestin.  
Li wê derê,  
ezmanê reş xwe tazî kir; rût û repa.  
Li wê derê,  
ezman reş li xwe kir, ewrên sor û zer.  
Li wê derê,  
can û jiyayê di bihuştê de hatin fetisandin.  
Li wê derê,  
xewn û xeyal  
di çavên ku wek rengê erdê de şewitîn,  
hîn ku negihîştin ronîya tavê..  
Li wê derê,  
duh  
li Hiroşîma..  
Li wê derê,  
îro

li Halepçe  
û sibê,  
kî dizane li kû?

### Bihare

Ax Biharê!  
Heta kengê rîya te bipê  
te dîsa bibînim..  
Stêrên bêçirûsk  
bişkîvîne li ezmanê bêsewt û deng  
siya gulên cemidî dane dest Mem  
û Zînê..  
Evîna wan dardakirî  
Jiyan bêbêhn û reng..  
Ax Biharê!  
Agirê dilê min  
Gola Wanê ya wek şîrê spî dixemilîne..  
Keçîkek bi rûyekî wek gulênisan  
helbesteke evîndariyê di nav nê de  
dide min.  
Ax Biharê!  
Ez girtiyê hesreteke kor yê çendan im  
ku tamerên min gungum in?  
Di hundirê min de daristanekê kesik  
heye..  
Ax Biharê!  
Ew, nezerên te ne  
yên ku guliyên min gulebaran dikin..





Li Navendên çandê çalakiyên vê hefteyê  
 Li Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM)  
 ● 5.1.1997 Yekşem  
 Film: Spartakus, S.Kubrick, saet:14.30  
 Teatra Jiyana Nû: Daweya Generalê Teneke, saet: 17.30  
 ● 10.1.1997 În  
 Gotûbêj li ser "Şerê hundirîn yê İspanyayê", Ertuğrul Kürkçü, saet:18.00  
 ● 11.1997 Şemî  
 Konser: Koma Rewşen (ji NÇM'ya Edeneyê), saet:14.30  
 Teatra Jiyana Nû: Daweya Generalê Teneke, saet:17.30

Li Evrensel Kültür merkezi (EKM)  
 ● 6.1.1997 Duşem  
 Konsera Sadık Gürbüz, saet:19.00  
 ● 9.1.1997 Pêncşem: Film: Di bin Agir de (Under Fire), saet:17.00  
 ● 10.1.1997 În:  
 Bîranîna Mitin Göktepe, saet:19.00-24.00  
 Cih: Cafer Ağa Spor Salonu, Kadıköy  
 ● 11.1.1997 Şemî  
 Semîner: "Çapemenî û Desthilatdarî", beşdar: Ertan Aydın, Yaşar Öztürk, saet: 19.30

## RÛDAN

# YRWK'ê xwe fesh kir

**Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên ên Kurdistanê (YRWK) konferansa xwe ya şeşemîn li dar xist. Di vê konferansê de hate diyarkirin ku rewşenbîrên kurd gelek rêxistin û yekîtiyên avakirine, lewre jî YRWK'ê mîsyona xwe bîriye serî. Di cihê YRWK'ê de koordînasyonê hate avakirin.**

Li bajarê Puldayê yê Almaniyayê di navbera 26 û 27'ê berfanbara 1996'an de Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên ên Kurdistanê (YRWK) konferansa xwe ya şeşemîn li dar xist. 64 rewşenbîrên kurd beşdarî vê konferansê bûn. Şêrko Bêkes, M. Emîn Pencewîni, Amed Tigrîs, Selîm Ferat, Faysal Dağlı, Hüseyin Kartal, Necîp Balayî, Abdullah Uzun û Bextiyar Elî hin ji wan rewşenbîrên bûn.

Di destpêka konferansê de Faysal Dağlı li ser dîroka rewşenbîrên - kurd semînerê da, piştî wî Abdullah Uzun li ser dîroka YRWK'ê semînerê pêşkêş kir. Piştî re jî guftûgo çêbû.

Beşdarên konferansê di dawiya konferansê de gihîştin van biryaran: Piştî 8 saliya damezirandina YRWK'ê ji ber sazûna rêxistinên mîna Enstîtuya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanistê, Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê, Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê, Yekîtiya Mamosteyan Kurdistanê, Yekîtiya Hiqûqnasên Kurdistanê, Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê, Yekîtiya Wênesazên Kurdistanê û Akademiya Kurdî mîsyona YRWK'ê ji holê rabûye.

Ew sazî wê barê YRWK'ê hilgirin ser milên xwe. Lê divê di cihê YRWK'ê de koordînasyonê ji bo çand, huner û perwerdehiyê bê sazki-

rin. Her sazî wê di nava koordînasyonê de ji warê xwe berpirs bin. Erka koordînasyonê şewirkarî û xurtkirina têkiliyan e.

Ji bilî van biryaran, li ser Kampa Etrûşê jî biryar hate stendin. Di gel nameyên ji serokên YNK û PDK re, bi nameyekê helwesta Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNCHR) hate protestokirin.

Di nameya xwe de rewşenbîrên kurd ji UNHCR'ê dixwazin ku biryara valakirina Kampa Etrûşê bi şûn ve bigire. Di nameyê tê gotin ku "li gorî zagonên Neteweyên Yekbûyî mafê penaberên Kampa Etrûşê heye ku daxwaza parastina jiyana xwe bikin û têkiliyên bi rêxistinên siyasî re jî li wan nehatiye qedexekirin, lewre jî biryara valakirina kampê ne di cihê xwe de ye.

Disa rewşenbîrên kurd ji Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mesûd Barzanî û Serokê Yekîtiyê Niştîmanî Kurdistan (YNK) Celal Talabani re jî name şandin. Di vê nameyê de tê gotin ku penaberîya li welatê xwe encama dagirbûna Kurdistanê ye û kurdên ji parçeyên cuda her tim li hev xwedî derketine. Lewre divê ew jî li penaberên kurd xwedî derkevin.

S. BERBEYAN

## TÎŞK

ŞÛKRÛ GÛLMÛŞ



## Li biyaniyê sê kulîlk

Di sala 1970'yî de em li welat, gel û zimanê dayika xwe vegeyriyan. Em li dibistanên dagirker û mijokdaran bûn. Ez di dibistana zarokan de bûm. Ezê bibûma mamosteyê zorakan. Minê serê zarokên gelê xwe bi jehra kemalîzmê bişûsta.

Min ev nekir. Ez bi zimanekî zelal, bi dilekî şad, xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe hîn bûm. Min rastiya xwe di van gotinên mamosteyê mezin û nemir Cegerxwîn de dît:

"Min digot qey tu bi ziman î  
 Lê bi kurdî nizanî"

Li Almaniyayê, li bajarê Essenê mamoste Hüseyin Kartal dersên zimanê kurdî didan. Ez jî li wê dersê amade bûm. Wexta mirov nebe şagirtê gelê xwe nikare bibe mamosteyê wî. Wekî birekê be, yekê bide, yekê bistîne. Ne weke tefşo be. Nebêje "Yek ji min re, dido dîsa ji min re." Min li dersa Mamosta Hüseyin sê kulîlk dîtîn. Ji sê bexçeyê gelan, sê kulîlk.

Ya yekemîn, navê wê Şehrîban bû. Qîzeke kurd, ji derdora Dersimê bû. Gulek sirgûnî bû. Malbata wê ji qetlîama Misto reviyabû. Çûbû bajarê Qeyseriyê, gundê Sarizê. Dapîr û bapîrê wê, dê û bavên wê bi kurdî zanibûn. Min ew di dersê de dît. Mirovekî kurd, lê bi kurdî nezanibû. Bala min kişand.

Angelika min berê dîtibû. Li komeleya Esenê me hev du nas kir. Ji dûr ve jî, mirov dizanibû ku Angelika alman e. Porzêrîn, çavşîn bû. Bi kurdan re bi kurdî, bi tirkan re tirkî, bi almanan re bi almanî diaxivî. Peyvîna wê ya bi kurdî, gramatik, rast û zelal bû. Cara yekem, ez şaş mam. Li ber xwe ketim. "Çawa miroveke alman, ji min çêtir zimanê min zanibe?" Lê taliyê ez, pir kêfxweş bûm. Min ji hevalên komeleyê re got: "Werin, werin!.. Binêrin, zimanê me, ji me çêtir dizane. Piçekî şerm bikin, vegeyriyan bi zimanê xwe biaxivin, bixwînin û hîn bibin." Serokê komeleyê heval Cemîl: "Mamosta bila Angelika dersê bide me..." Angelika kenîya û got: "Na, na!.. Ez hê baş hîn nebûme. Hûn herin ba mamosta Hüseyin. Bikevin kursa kurdî. Ji we re pir şermekî mezin e. Hûn çawa bi zimanê xwe nizanin. Gere ez ji we hîn bibûma. "Ji bona vê yekê Angelika jî, bû nimûneya min a dudîyan. Mînakê: Temsîleke pir giîng bû ji bo min û ji bo hemû kurdan.

Di nava wan hevalan de, min hevlekî tirk dît. Ew ji hemûyan ferztir bû ji bo min; min qerara xwe da, minê bi wan hevalan re şîrove û hevpeyvînek çêbikira. Min ji wan re got: Destûra wan stend. Lê mişkulatek derket pêşberî me. Her sê hevalan jî, nedixwestin ku navê wan ê rast bê nivîsandin, sûretê wan bê kişandin. Lewre, di çûn û hatina Tirkiyeyê de, wê astengî derketa. Lakîn, şîrove bêwêne ne xweş e. Hûnê zanibin ku, hikmê Roma teres li wê Almaniyayê jî hîna berdewam e. Li ser navên wan hevalan ez, di xwazim li wê kêmasiya me biborin. Armanc, ne wênekirin e, mesele ji sê aliyan de jî, kurdî û zanîna kurdî ye.




# Kerê qehreman

Ev çîrok min ji devê Şêx Şakirê Qaso yê ji gundê Zorava bihîstiyê û min bi helbestî nivîsî, belê şêx bi xwe helbestek li ser vê bûyerê nivîsiye, ya din hinek cihên bûyerê hatine guhertin, ji bilî wan çîrok durist e.

Kerê Qehreman hebû tune bû  
Rehmet li dê û bavê me  
Û guhdarên me bû,  
Ji bilî dereka û cendirman.  
Ew didin me nan û nîskê,  
Dixwin goşt û qawirman.  
Kerekî cûn hebû  
Li gundekî ava bû  
Li başûrê welatê me bû  
Ker zana bû, zîrek bû  
Gelek bi xwe ewle bû  
Têrê bû, aza bû  
Hevsarê wî tune bû,  
Geh dihate axurê xwe  
Geh li ser bêderan gevze bû  
Xwediyekî wî hebû  
Bêsinc û bêtore bû  
Reşik bû, por xelek bû  
Pêxwas û bêole bû  
Rewşa kerê qehreman  
Bi wî re bêwate bû  
Bi sixêf û bi daran  
Ew dajote bin baran  
Kê ker ji wî bixwesta  
Wî nedigirt ji desta  
Rojek ji rojê Xwedê  
Ker ji xwe re ket qadê  
Kerê cûn pir westiya  
Mejiyê wî çelqiya  
Kete ser çewalê ceh  
Delavê xwe kire deh  
Derbas bû gova berxika  
Çendik kuştin bi zîtika  
Xwedî hate ker bi dar  
Kerî qet jê danexwar  
Piştî xwe da xwediyê xwe  
Derxist kuna dilê xwe  
Pînek avêt eniyê  
Xwîn herikî bi lehiyê  
Li hev civiyar kesên gund  
Li dora term bûne kund  
Wê çî bikin, çî bêjin  
Mitalê bûn tev bêpêjin  
Mezin hatin çî biryar  
Guh û terî bûne mijar  
Guhek jê bû, terî birin  
Ji gund derket bêvegerin  
Ker reviya çol û bilan  
Hêstir û xwîn lê bûn belan  
Berê xwe da çiyayê jor  
Ew nizane çî ye leşker, çî ye sînor.  
Serxet çî ye, bînxet çî ye  
Râst berî daye beqçî ye  
Derbas kir dafîka mirinê  
Nû zerayê dabû dinê  
Ker bîyan bû bêpasaport

Ji nişka xwe li rexê din dît  
Ji kêfa re ker ziriya  
Ji tirsî berik terqiya  
Yê li kozikê, wî lot neda  
Reha dilan qetiya  
Kerê rêzan bi lez û bez  
Kete nav dar û deviyar  
Deng û basên wî zû belav bûn  
Li deverê, hinan digot dogehî ye  
Hinan digot bihuştî ye  
Hinan digot li hebîsa darê vişartî ye  
Hinan digot li şikeftên gugurî ye  
Kerê xwînî bêxwedî ye  
Ew nesax e, ne mirî ye  
Şêxek li wê hêlê heye  
Bêşaşîk û bêcube ye  
Hin baweriyên wî hene  
Ji yê mirovan cuda ne  
Geh şêx e, geh mele ye  
geh pîr e geh keşe ye  
Nûçeyên ker jê nehatin  
her saet û her deqe ye  
Ker tapkirî anî malê  
Kir dost û hevalê xwe ye  
Ew şûst, ew deran kir  
Pê ve kir nivîstî û paye ye  
Ker delalî rakiriye  
Kes nizane ji bo çî ye  
Xalê Mûsa ji Sitililê  
Êşa giran li wî heye  
Çaxa ku ev çîrok bihîst  
Ji dil xiste serê xwe ye  
Pênûs kişand pelek anî  
Nivîsî jêr yek name ye  
Şêxê minî yê birûmet  
Herî bilind û zane ye  
Tu wî şêrî, qehremanî  
Bişîne mêvanê me ye  
Bersiva Şêx jî da, ev bû  
Tewra te di cihê xwe de ye  
Kekê Mûsa tu hêja yî  
Te pê ve nîn e mezin e  
Her tiştê me li ber te ye  
Tu min dikî li mal û jin e  
bo şandina vî pilingî  
Bi te re ev mercê min e  
1) Dora Sitililê baxçe ne  
Hin jê ceh e, hin kizin e  
Ker dakeve zeviya kê  
Divê ew neke pinpin e  
2) Kerê min li ya kê siwar be,  
Qet nabe bike gazin e.  
3) Çaxa ku ker bike razê,  
Gul û beybûna bixin bin e.



BERHEVKAN

ABAS İSMAIL- QAMIŞEQ



# Salnameya NÇM'ê

Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) îsal salnameyeke diwêr bi navê "Salnameya rojê ya Bi Demjmêr" weşand.

Salname bi giranî bi zaravayê Kurmancî ye, lê heftiyê rojek bi kirdkî (zazazî) ye.

Di vê salnameya NÇM'ê de, ku yekemîn car ew tiştêki wiha dikin, mijar û babetên cihê cihê hene. Di salnameyê de gelek nivîsên Apê Mûsa balê dikişînin.

Mîrov di nav rûpelên vê salnameyê de leqayî mijarên mîna dîrok, wêje, cografya, stran, çîrok, pêkenok, mamik, met-helot, listikên zarokan, tarîfa xwarinan, danasîna şexsiyetên navdar, gotinên peşiyân, wêcîze, navên ji bo zarokan tê. Ji Welat, Welatê Me, Jiyan Rewşen û Nûdem Werger û gelek nivîs hatine girtin.

Hicri: 1417 Sabun 21  
Roj: 1 Sermayez 55

Romi: 1412 Beribantou 19  
Dîrojûna Rojê: 1d Gêr

Kurdî: 2096 Berfanbar 12

AMSD	WAN	STRABOK
8:00	8:45	9:30
9:00	9:30	10:00
10:00	10:30	11:00
11:00	11:30	12:00
12:00	12:30	13:00
13:00	13:30	14:00
14:00	14:30	15:00
15:00	15:30	16:00
16:00	16:30	17:00

1997

Rêbendan

1

Çarşem


Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmettir dîstek min e  
Ho Shi Pirnê

Yên ku bi serketina xwe bawer in, bi ser dîkevin.  
Vergilîto

Di bin serokatiya Fidel Castro de Şoreşa Kubayê  
(1959)

Salnameya Rojê ya Bi Demjmêr

## MEDENÎ FERHO HEY GERÎLLA



ABeCe // helbest

# Hey Gerîla

Hey Gerîla, navê pirtûka helbestê ya nivîsarê me Medenî Ferho ye. Ev berhem ji aliyê Weşanên ABE Ceyê ve li Belçîkayê hatiye weşandin.

Medenî Ferho, ku bi tirkî jî roman û helbestan dinivîse û berhemên wî yê weşandî jî hene, bi awayê serbest helbestên xwe darajtine.

Di pirtûkê de sê heb helbest cih girtine, hin ji wan kurt û bi şeweya asayî (normal) ne û hin jî bi şeweyê destanî ne. Serokê Parlamentoya Kurdistanê ; 1 Derveyi Welat Yaşar Kaya jî, ji pirtûkê re "pêşgotin"ek delal nivîsiye.

Pirtûk 96 rûpel e û ji bo çapê kaxizê spî yê bi qalîte hatiye bikaranîn.

# Salnameya Dozê

Weşanxaneya Dozê ji bo sala 1997'an jî salnameya diwêr bi navê "Salnameya Roj Bi Demjmêr" weşand. Tê zanîn ku di heftiyê de rûpeleke wê jî bi kirdkî (zazakî) bû.

Salnameya îsal tenê bi kurmancî ye û li gorî ya parhîz zengîn û xweşiktir e. Weşanxane dide xuyakirin ku ji ber kêmasiyên teknîkî û bêwextiyê cih nedaye kirdkî.

Di salnameyê de mijar û dabaşên cur bi cur hene. Bi kurtî, mirov di wê salnameyê de rastî mijarên wekî gotinên peşiyân, wêcîzeyên kesên navdar, ji bo zarokan nav, dilok, tiştênok, pêkenok, agahiyên li ser şexsiyetên girîng ên dîrokî, siyasî, edebî û çandî, tarîfa xwarinan, tenduristî, bawerî, dîrok, fal... tê.

11:14 Sabun 21  
Romi: 1412 Beribantou 19  
Dîrojûna Rojê: 1d Gêr

Kurdî: 2096 Berfanbar 12

RÊBENDAN

1

ÇARŞEM

Serokê Mîlîtê, Kîrî 12 Berfanbar  
Hz. Muhamed hajrê Mekê fatih kir (630)

1997

DOZ

Salnameya Rojê ya Bi Demjmêr

Weşanên Doz ilk Belediye Cad. No: 5/6  
Tûnel/ Ist. Tlf-faks (0212) 2454137

## Mehek e em li te digerin!

JAN DOST



Rojekê ez ji kar vegeyîyam, ez pêrgî cîranekî xwe bûm, piştî silavan ji min re got:

- Niha du xortan pîrsa tê kirin!
- Du xort! Te nas kirin kî bûn?
- Na bi Xwedê, min ew tu carî nedîtine.
- Baş e, negotin çî dixwazin?
- Na min pîrs kir, wan "Em mamoste bibînin em dizanin em çî dixwazin", gotin..

Guman di serê min de li hev likumîn, gumanek dihat, yek diçû. Pir tişt hatin bîra min, gelo ev kî ne? Çî dixwazin? Dibe ku muxaberat bin, lê min li ba kesî qala hikûmetê nekiriye! Ez yekî hay ji xwe heme. A dibe ku mêvan bin. Lê

eger mêvan bin wê bersiva wan ji cîranê min re ne ew qasî ziwa be.

Gelo kî ne?! Min çendî mesele wergerande vî alî û wî alî, min ew her du xort nas nekirin. Bi rastî (hûn jî ne xerîb in) ez tirsîyam. Ma ne mafê min e ku ez bitirsim, ha? Yê netirse mêraniyê jî nas nake.

Ji bextê min yê reş, wan her du xortan sê çar roj neman li min pîrsîn, yanê av li ser xwe zelal kirin. Lê ez di aveke ji gumanên şêlû (pêrgî) de hiştim, ya hîn xerab, ez li kîjan dostî rast dihatim, kîjan xizim û mirovê xwe di bûm, digotin:

- Du xortan li te pîrsiye.
- Çî dixwestin?
- Em nizanin.

Waweylê, îcar wê çawa bibe, xwezî ev her du xort li min rast werin û çî dibe bila bibe, hefna bila yek ji wan Ezraîl (rihstîn) û melkemot be, tu dixwazî bila her du Munker û Nekîr bin.

Bes ez ji vê çirava gumanan xelas bûma. Êdî dihatin xewna min, dibûn dêw, kêftar, şeytanok û dest dixistin

zengeloka min. Êvarekê dengê derî hat, destê min li ser dilê min, min derî vekir, çî binêrim, rûyê min kete rûyê du xortên sembêlboqî, (hûn dizanin ruh şîrîn e) min çend ayetên Quranê ji ber kiribûn, min di dilê xwe de xwendin, dawiyê min got, ya rebî ew bin.

Piştî silavan û destdanê, min ew derbas kirin, bi lez min qehwe çêkir û li ber wan danî. Di nav gotinê re min nas kir. Ew in yê li min digerin, îcar min got çî dibe bila bibe. Ceger hate min û min pîrsî:

- Xêr e înşeleh! We li min pîrsû bû!
- Erê wele. Em bûn, ev bû mehek em li te digerin.
- Va ye we ez dîtîm. Xwedê bike tiştêki xêrê be?!

Yekî jî wan xwe ediland, balîfek ber bi xwe ve kişand û got:

- Xêr e. bûka me, wê van rojan biwelide. Îcar tu helbestvan î. Tu dikarî ji kerema xwe re çend navên kur û qîzan (bila xweş bin ha) ji me re di listeyekê de binivîsîn?!



Dewda Çermug de jew merdek beno, ney rê lajekî nêbenê, 3 domanî ci benê û 3 heme jî keynekî vejyênê. Qandê (serva) coya no hers beno û yeno cenyerdaxo ra vano:

– Bewn jenyeka mina delal, ti jî zana ez to ra zaf hes kena û qandê coya jî ezo nêwazena to biternî. La belê domanê mayê 4 jî keynek bo se, ezo to biternî. Cenyek: “Mêrdêkê mino delal, ti jî zanê ki mi dest niyo, ez se krî.”

Mêrdêk: “Ez nêzana, senî kena, biki xo rê ti zana.”

Bado cenyek o hala manena waxtê domanî biyayin beno, ewnenê domanê ci no 4 jî keynek vejyena. Mêrdêk hema hers beno û cenyerdaxo ra vano: Bewn cenyekî, min to ra verî vat: “Eger domanê mayê 4 jî lajek mebû se ezo to biternî. La belê to fina keynek ard dinya. Qandê coya ezo to ternena. Badê na seat ti ceniya-mi niya, xo rê şina kofî şo.

Cenyek senî kena, mêrdêk vano nê mi ti ternava, a jî tepşena şina kêdê pêrdê xo û piyê ci ewneno awa bermena, piyê ci vano: “Se biyo keyna mi, tiya ci ra bermena?”

Cenyek: “Mêrdê yê mi, ez ternava.”


Piyê cenyek: “Qandê çiyo?”

Cenyek: “Domanê mi 4 jî keynek vejyê, qandê coya.”

Hema piyê cenyek, piyê lajekî û pêlê nînan kewnê werte, mabenê nînan vînenê û nînan ra vanê:

– Mabendê Mêrdîn û Amedî de ziyareta Siltan Şêxmûsî estê, êkê ci rê lajekî nêbenê, ê şinê na ziyaret înanrê laj beno, şima jî finê şirê na ziyaret belkî şima rê

# Komînîzm Ltd Ştî



jî laj beno.

Nê hema danê piro, şinê ziyareta Siltan Şêxmûsî, badê na ziyaret nînan rê 2 lajekî jû ra benê. Nê tepşênê nameyê jêwerî Şêxmûs û jêwerî Xelîl nanê pa. Badê nînan ci rê 3 domanî benê û 3 heme jî lajekî benê. Piyê ci jî tepşeno nînan rêşeno mektep, waxto ki mektep wendê, Xelîl beno nêweş û mireno. Şêxmûs jî mektepê siftayinî qedînenno û piyê ci jî, ci rêşeno îmam hatîp wazeno ke, Şêxmûs mila (seyda mele) bo. Lajek îmam hatîbî qedînenno, beno mila û şino dewda Çermug de milayin keno. Dewa ke milayin keno, vija jew mêrdêko komunîst silasneno (şinasneno), no mêrdêk waxtê zaf kilmî miyan de ney jî keno komunîst. No waxto ke beno komunîst, mila-

– Aferim min û to rê, helal bo min û to rê, cenyeka mina delal.  
Cenyek vana: “Sebiyo mêrdêk, no çi halê to yo?”  
– Diha se bo cenyek, vîjdana mi bidî, Şêxmûsî Stenbol de şîrket akerdo.  
Cenyek: “Şîrketê çiyo, uvo çiçi ser xeftiyeno.”  
– Cenyeka mina delal senî ke vat şîrket akerdo, min kêf ra xo vîra kerd pers kirî, la belê ti jî zana şîrket akerdin karê domanan niyo, wa şîrket bo çiçi ser beno wa bibo, la belê ti bipawi, ez şîrî pers kirî hele çiçi ser akerdo, uwo îthalat û îhracatê çiçi keno. Mêrdêk hema yeno lajekî het û vano:  
– To min ra vat Şêxmûsî şîrket akerdo, min xo vîra kerd to ra pers kirî, no şîrketê çiç yo, îthalat û îhracatê çiçi keno?  
Lajek: “Dedo, mi dayê to ra vatayê, ez ewnava ke, ti biye vinî. La belê ez nika to ra vajî. Nameyê şîrketî Kom. Ltd. Ştî. yo.”  
Mêrdêk: “Kom Ltd. Ştî. çiç yo?”  
– Komunîzm lîmîted şîrketî, yanê îthalat û îhracatê komunîzm keno.  
– La bêmirad şiyaye, komunîzm vatîna bê dîn vatîno.  
– Dedo ez se krî lajê to yo, ê karan keno mi rê çiçi, hem ez jî komunîst a.  
Lajek senî wina vano, mêrdêk kewno lajekî dim û vano, “La bê dîn û bê îmanî, la moskovan ra kewtey, ma şima riştî îmam hatîp milay bê, şima şiyê biyê komunîstî, şima ke kewnê mi dest şima finena pošta qaf şima vindirê.”  
MEMED DREWŞ

– Dedo nûn dî, uwo vija xeftiyeno û karê ci jî zaf rind o û jew şîrket akerdo.


Hema piyê lajekî vazdeno hetê keyiya û ray de kamî vînenno vano “Domananê xo birêşê îmam hatîp, min lajê xo rişt îmam hatîp, lajê min bi mardim û Stenbol de şîrket akerdo, karê ci jî zaf rind o. Kamo wazeno domanê ci mardim bo, wa birêşê îmam hatîp”. Mêrdêk hema yeno keye û hema lew nano cenyerdaxwa û vano:

## BIXELAT...

Çar	R	P	B	M	K	N	M
Z	E	R	F	X	A	N	I
S	E	R	E	D	A	N	N
S	A	N	E	D	E	R	D
D	M	E	N	Ç	A	R	E
A	X	E	R	D	A	N	E
A	X	R	E	T	L		
Î	N	A	D	A	Y	A	
E	M	A	E	K			
Û	E	R	M	E	N	Î	

## Bersiva Xaçepirsa 47'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 49'an pirtûka “Baxçeyê Vişne” ya ÇEXOV e.  
Jêrenot:  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 47'an, pirtûka Mayakovskî “Şiirên Bijarte”, Safiye Akdağ/ İzmir, Jiyan Romîzêr/ Batman, Hamdullah Bakî/ Karacadağ, Yılmaz Melek/ Stenbol, Hakkı Uysal/ Enqere

## XAÇEPIRSA BIXELAT (49)

## XAÇEPIRSA

Beyreq	Ferminyûm	Vitrîn	Hidrojen	Cinavka şanidanê	Elementek
Merezdar	Niviskarek (wêne)	Eddet	Xweşik	Pêlava berfê	
7				Pût	
				Aşiq, evîndar	
Nifir		Lise		9	
Gihanekek		Cinavkeke kesane			
	Şaristani bajarvani				4
	Devê kûra agir				
Teyrikekî ku dike qebqeb		3	Lehengêkî mitolojîk		Argon
Zemîn					ÿyot
		Surwe Dewleteke cîran	1	Dijî birinê	8
				Dij	
Xirabeyek li Qersê		Xwarina sereke			
Listikên kompîture		Rojek			
			10	Qertafa neyînî	
				Cinavkeke kesane	
Spartina tîştan					Tipek
Êş, azar					
		Serokê mirektiyê	6		

PEYVA VEŞARÎ

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
---	---	---	---	---	---	---	---	---	----





Nûnerê me yê Îzmîrê Ferec Çobanoğlu serpehatiya xwe ya li Emniyeta Aydinê vegot:

## Emê te û rojnameya te bi hev re bişewitînin

**Ji min re gotin: "Tu endamê van sazgehan kîjanê bî jî (HADEP, MKM, TAYDER, Özgür Halk, Demokrasi, Azadiya Welat) ji me re xem nîn e û tu xebatkarê PKK'ê yê siyasî yî. Ger tu werî Aydinê emê te û rojnameya te bi hev re bişewitînin."**

**N**ûnerê me yê Herêma Îzmîrê Ferec Çobanoğlu roja 20'ê berfanberê (1996) de li Aydinê ji aliyê polîsan antî-terorê ve hate girtin û rojekê di bin çav de ma. Piştî îşkence, gefxwarin û heqaretan dotira rojê ew derxistin dadgehê û li wir hate berdan.

Em ji devê nûnerê xwe, serpehatiya wî diweşînin

\*\*\*

Ev 11 car e ku ez tême girtin û îşkence li min dibim. Hemû metodên îşkenceyê li ser min hatine ceribandin. Ez gelek caran li Weqfa Mafên Mirovan tedawî bûme. Sala çûyî ez dikirî felc bibûma ji piştî xwe.

Hêzên dewletê qet bi çavê rojnameger li me nanihêrin. Lewre her dem ez wekî berpirsê PKK'ê yê ramyarî (siyasî) hatime darizandin. Îcar jî ji min re gotin: "Tu endamê van sazgehan kîjanê bî jî (HADEP, MKM, TAYDER, Özgür Halk, Demokrasi, Azadiya Welat) ji me re xem nîn e û tu xebatkarê PKK'ê yê ramyarî yî. Ger tu werî Aydinê emê te û rojnameya te bi hev re bişewitînin."

Vê cara dawiyê, ji bo ku rojnameyê bigihjînim xwendevanan, ez çûbûm Aydinê, 19'ê berfanbarê bû. Ez şevê li wir mam û ezê di 20'ê mehê de vegiriyama Îzmîrê. Polîsan li ba hevlekî ji HADEP'ê ez ji rawestgeha trimbêlan girtim, ez li taxsiyê siwar kirim. Hema ji min re gotin:

"Navê te yê kod Wezîr e û em li te digerin."

Jixwe ji binî de derew bû gotina wan û haya min bi xwe jî ji navekî bi vî rengî nîn bû.

Ez birim Emniyeta Ewletiyê ya Aydinê û ez bi asansorê hildam jor û çavê min bi çefiyeke reşbelek girêdan. Nasnameya min tespît kirin û jê pê ve dest bi lêdanê û pirsan kirin. Wekî 2-3 saetan lêdanê û pirsan dom kir û taliyê saet li dora 8-9 ê êvarî ez birim "Meşrutiyet Polis Karokolu" û avêtim hucre. Li dora 10-11'ê şevê de di-sa hatin wekî 1-1,5 saetê lêdan û pirsên xwe kirin. Gotin:

"Ger tu nebêjî ez ji PKK'ê re dixebitim, emê te winda bikin û cendekê te biavêjin bin Pira Çemê Menderesê. Jixwe kesî nedîtîye ku me tu girtiye."

Min jî got: "Kes bibîne nebîne ne girîng e ji bo me. Hûn dikarin êskere jî winda bikin, hûn bi kêfa xwe ne."

Gava ku min werê digot, hem dibehcîn û hem jî dikeniyen. Careke din dev ji min berdan û ez di-sa avêtim hucre. Li dora saet 4-5'ê sibê hatin ez birim Emniyeta Ewletiyê û îfadeya min girtin. Tiştên ku kok û bintar tune bûn berê stûyê min didan. Lewre min qebûl nekirin.

Roja şemiyê (21 berfanbar) ez derxistim dadgehê. Pêşî dozger îfadeya min girt û got: "Te gelek tişt pejirandine." Min jî got ku "Dozgerê birêz, min tu tişt qebûl nekiriye.



Di destê wan ekibên terorê de vîna mîrov namîne. Ew qas îşkence li te bikin tuyê jî wekî wan bikî, lê min di-sa jî wekî wan nekir." Min gote ku ez nûnerê rojnameya Azadiya Welat im. Wan jî got ku "Ji bo ku tu bibî PKK'yi ev bes e."

Niha ez ji we dipirsim dozgerê birêz. Ger bi riya ve rojnameyê bûme endamê PKK'ê, wê çaxê dewletê jî PKK nas kiriye. Ji ber ku ew rojname bi awayekî qanûnî, li Stenbolê tê weşandin."

Dozger tiştê ji min re negot. Yê hate hesabê wî nivîsandin û yê din jî nenivîsandin. Dû re ez şandim cem dadger. Min ev tişt li wir jî gotin. Dadger jî weke dozger got ku ji bo tewkîfîkirinê tu sedemên berbiçav tune ne, ji ber vê yekê ez serbest berdame.

### WELAT

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNİŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerîndeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Giştî  
yê Ewropayê:

Mazhar Günbat  
Suriye: Jan Dost  
Helîm Yûsiv  
jBerlin:

Silêman Sido  
49-30-69002695

Hannover:  
Selim Biçûk  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

Bruksel:  
Medenî Ferho  
32-02-466037

Stockholm:  
Robin Rewşen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçlıç  
49 228 66 62 49

Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36



# Liceyî dixwazin bi serbilindî bijîn

Îro jî dewlet şerekî psikolojîk li Licê dimeşîne, ev şer ji qetlîamê, ji hovîtiyê jî borî, bi darê zorê dixwaze gelê Licê bike cerdevan. Bi awayekî din polîtîkayeke nû daye pêşiya xwe. Heta niha gund vala dikirin, îcar jî dest pê kiriye navçeyan vala dike, slogan a wê jî ev e: 'An hûnê bibine cerdevan, an jî hûnê ji vir herin'

**h**inek ji me li meyxaneyê bi qe-dehên araqê xwe dixapînin, hinek ji me bi guleyên dijmin birayên xwe dikujin, hinek ji me li kolanên bajaran koletiya ko-leyan dikin. Hinek ji me jî bo çengek azadî bi xwîna xwe axa welat dişon, hinek ji me jî bo ku mafê gelê xwe diparêze bi guleke xayîn tê qetilkirin, hinek ji me jî ji bo ku ji welatê xwe dûr nekeve di bin zilmê de bang dikin: "Li me xwedî derkevin." Çendekî berê Dêrsim bû, Culemêrg bû, Wardo (Gim-gim) bû îcar jî Lice. Her ku ew naxwazin bibin xayînê welatê xwe, zilm li wan tê kirin, gef li wan tên xwarin.

Dijminatîyêkê dewletê taybet ya jî Dêrsim û Licê re heye, ew dever cihên serhildan û berxwedanan in. Cara yekemîn Licê ji aliyê Şêx Seîd ve di 21'ê reşemîya 1924'an de ji destê dijmin hate rizgarkirin. Cara duyemîn jî di sala 1978'an de bi avabûna PKK'ê re bû kelmê çavên dijmin. Ji destpêka salên 1990'î ta niha bi caran dewletê êrîş birin ser Licê, di 9'ê adara 1993'an de cerdevanan û hêzên dewletê serê sibê êrîş birin ser Licê; 7 kes kuştin 12 kes birindar kirin, navçe wêran kirin. Di 4'ê rêbendan 1994'an de hêzên dewletê otobûseke Liceyê gulebaran kirin; 3 kes kuştin pir kes jî birindar kirin. Gelek caran jî dewletê êrîş birin ser gundên Licê, gundî kuştin. Ji 56 gundan 46 gund hatine wêrankirin, şewitandin.

Îro jî dewlet şerekî psikolojîk li Licê dimeşîne, ev şer ji qetlîamê, ji hovîtiyê jî borî, bi darê zorê dixwaze gelê Licê bike cerdevan. Bi awayekî din polîtîkayeke nû daye pêşiya xwe. Heta niha gund vala dikirin, îcar jî dest pê kiriye navçeyan vala dike, slogan a wan jî ev e: 'An hûnê bibine cerdevan, an jî hûnê ji vir herin'

Li aliyê din rewşenbîrên ku ji Licê ne jî li Enqere û Stenbolê ji aliyê hêzên tarî ve hatine kuştin. Wekî Behçet Cantürk û parêzer Yusuf Ekinci. Ekinci di 25'ê reşemîya 1993'an de li Enqereyê hate kuştin. Birayê Yusuf Ekinci parêzer Tarîk Ziya Ekinci li ser kuştina birayê xwe ev nixandî kir "Dewlet bi kuştina rewşenbîrên kurd li ser gel tero-

rê dimeşîne wehşetê pêk tîne". Me pir-seke wiha jê kir: 'Gelo dewlet îro dixwaze li Licê çibike?' Tarîk Ekinci ev bersiv da pirsê me: "Dewlet bêsêbeb û bêyî ku tu tişt li Licê biqewime êrîşan dibê ser gundan, ser gelê Licê. Wekî çawa ku di sala 1992, 1993'yan de bêsêbeb li Licê qetlîam pêk anî, gotin ku 'PKK'yî di nav wan de ne, ew PKK'yî yan diparêzin' heta generalekî bi navê Bahtiyar Aydın hate kuştin. Gotin 'PKK'ê kuştîye' lê pişt re derkete holê ku wan bi xwe kuştîye. Mebesta dewletê şiddet, teror û tirsandina kurdan e." Ekinci li ser pirsê me ya "Li Dêrsimê, li Culemêrgê û li deverên Kurdistanê yêndin jî bûyerên bi vî rengî qewimîn, bi dehan heyet çûn û dawiyê de hê jî zilma dewletê didome" jî wiha axivî: "Ev girêdayî helwesta raya giştî ye, ez bang li kesên demokrat, aştîxwaz dikim bila li Licê xwedî derkevin. Em Yugoslavayê dibînin, 45 roj in ku gel li ser piyan e. Heta jî sedî 50'yê gel ranebe piyan, van bûyeran protesto neke, li hemberî kirinên dewletê dernekeve wê ev bûyer bidomin, jixwe dewlet jî tişteki wiha dixwaze."

Li aliyê din heyeta ku ji IHD, KESK, HADEP hin partiyên tirk, rojnamevan û hunermendan pêk hatibû piştî ku ji Licê veqerîya daxuyand ku tu kes li ser daxwaza xwe nebûye cerdevan, da ku li hemberî qaymeqam (Serleşkerêk bi bi navê Hacı İbbaş bi wekaleti li cihê qaymeqam dînhêre) gotine 'em naxwazin bibine cerdevan.' Sekreterê Giştî yê KESK'ê Faysal Özçift xwestîye rewşa ku gelên Licê tê de ye bîne zîman, ji aliyê polisên sivil ve lê gef hatiye xwarin û polisên êrîş wî kirine. Lêşkeran jî wan xwestîye ku ew bi lezgîni jî navçeyê dûr bikevin

Dîsa heyeteke ku ji İtalyayê hatibû jî dewletê destûrê nade ku ew herine Licê. Li ser vê yekê jî me ji Komeleya Mafên Mirovan a Amedê jî parêzer Osman Baydemir pirs kir; gelo dewlet çima nahêle heyetên biyan bikevîne Licê? Baydemir wiha bersiv da: "Dewlet naxwaze kes kirinên wan hîn bibê, ji ber vê yekê jî nahêlin heyetên biyan bikevîne Licê, ne tenê heyetên biyan ji 1993'an vir ye tu heyet û rojnamevan



nekarîne bikvîne Licê, heta Tansu Çiller û Deniz Baykal jî nikaribûn herine Licê û deverên Kurdistanê yêndin, ev kirinên wan ne hiqûqî ne, ne jî li gorî mafên mirovan e. Emê heta dawiyê ve bûyerê teqîb bikin"

Dewletê gîra xwe ya li hemberî Licê venaşere. Serleşkerêk li nav Licê bang dike: "PKK'ê li vê derê dest pê kir, emê li vê derê biqedînin." Ev gotin acizbûna wan a li hemberî PKK'ê û êrîşên li ser gel rasterast destnîşan dike. Dîsa rapora MGK'ê re li ber êrîşên bi vî rengî vekir. Bi salan e ku dewlet li Ewrûpayê

dibêje "Pirsgirêka kurdî tune, li Tirkîyeyê teror heye" lê kes nabîne, kes nabihîze, tiştê ku kurd dijîn li her derê eynî ye. Heta kurd bi xwe jî ji li hemberî van kirinên kirêt bêdeng dimînin. Keçikeke 12-13 salî li Licê bi dengêki bilind û ji çavên wê hêstir tên daxive: "Bombe avêtine mala me, birayê min mirin, birayekî min tenê maye, ew jî bi darê zorê kirine cerdevan. Em cerdevanîyê naxwazin." Her tişt li ber çavên me wekî filmekî derbas dibê, em hê jî nabînin, hê jî em di xewê de ne.

METİN AKSOY